Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1393 12-Tîrmeh-2026 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Helbestvanî hunera zindîkirina payvan e’

Berçem Silêman/ Dêrik

**Helbestvan Fayîq Hesen diyar kir ku helbestvan ew kesê ku peyv, hest û ramanên kûr bi ritm û hostatî tîne ziman û wiha got: “Helbestvan ne tenê nivîskareke, ew hunermendeke ku bi rêya zimên wêneyên hestiyar di hişê mirovan de xêz dike.”**

Helbestvan ew kes ê ku zimanê rojane diguherîne hunerê. Helbestvanî her çend wekî karekî pîşeyî neyê dîtin jî, ew şêwazekî jiyanê û nihêrînek taybet e li cîhanê. Ew tiştên ku mirovên asayî dibînin û jê derbas dibin, bi kûrayî hîs dike. Hestên mîna evîn, êş, azadî, tenêtî û mirinê bi şêwazekî muzîkal tîne ziman. Helbestvan Fayîq Hesen jî yek ji wan helbestvana ye ku rewşa welatê xwe bi awayekî helbestî hûnandiye û ji derdorê re ragihandiye.

**Kurtejiyana Fayîq Hesen**

Fayîq Hesen di sala 1978‘an de li gundê Şekirxaçê yê girêdayî bajarê Dêrikê ji dayîk bûye, li wir dibistana seretayî xwendiye û ya navîn û amadehî li bajarê Dêrikê qedandiye. Piştî qedandina dibistanê û bidestxistina bawernameya amadehî wî berê xwe da fakulteya şerîa ya li paytexta Şamê li wir du salan xwendin lê derfet nebûn ku bidawî bike lewma nîvço ma. Piştî ku Şoreşa Rojava dest pê kir êdî ew tevlî korsên zimanê kurdî bû. Êdî ew eşqa zimanê kurdî di dilî wî de mezin bû û xwest derdorê jî fêr bike, lewma berê xwe da dibistanan û 4 salan waneyên zimanê kurdî da. Lê heskirina wî ji zimanê dayîkê re li vir nerawestiya lê belê berê xwe da zanîngeha Rojava û li wir beşê wêjeya Kurdî xwend û sala 2023-2024’an derçû. Her wiha wî 8 salan cihê xwe di rêvebertiya dibistana seretayî ya gundê Şekirxaçê de girt. Ji bo hin sedemên taybet ew dûrî karê mamosteyê ket, êdî wî ji bo debara malbata xwe berê xwe da karekî serbest dike.

**Nivîs û heskirina helbestê**

Heskirina Fayîq Hesen ji nivîs û helbestê re ji zarokatiyê ve pêre mezin bû, dema xwest hest û asoyên xwe bîne ziman destpêkê bi zimanê erebî dinvîsanin, lê hertim hîs dikir ku mafê helbestê xwe nadê wan ji ber ku ne bi zimanê dayîkê dinvîse. Lê piştî ku wî xwe fêrî zimanê kurdî kir êdî ew eşqa ziman bi riya helbestê derxist û hemû êş, şîn, kêfxweşî, evînî û hezkirina welatê xwe bi awayekî lihevhatî hûnandin. Heya niha nêzî 23 helbestên wî bi zimanê kurdî hene, lê mixabin heya niha ew derfet nedîtiye ku hin berhemên taybet çêbike. Tevî ku tevlî gelek çalakiyên hunerî, şevbuhêrk, festîval û çivatên wêjeyî bûye. Gelek hewildanên wî hebûn ku kurteçîrokan jî binvîse lê xwe di wî warî de nedîtî êdî hestê xwe ber bi helbestê ve herikandin. Di derbarî nivîsa helbestê û wateya wê di jiyana wî de helbestvan Fayîq Hesen ji Rojnameya me re axivî.

**‘Helbestvan xwedî roleke pir girînge’**

Helestvan Fayîq Hesen anî ziman ku di dîrokê de û heya roja îro jî, helbestvan xwedî roleke pir girînge û wiha got: “Helbestvan ne tenê ji bo xwe, lê jî bo civakê jî dinvîsin ji ber ku ew dengê Gel e, di dema şer, zilm an jî guhertinên civakî de, helbestvan dibin dengê bindestan û daxwaza azadiyê dikin. Di heman demê de helbestvan zimanê zikmakî diparêzin, peyvên veşartî û windayî derdixin pêş û ziman dewlemend dikin. Li kêlek vê yekê helbestvan di navbera kûrahiya dilê mirov û cîhana derve de pirekê ava dikin. piraniya helbestên min welatparêzîne, çi bûyereke ku li welatê min rûdide ez bi riya helbestê hestên xwe tînim ziman û dinvîsînim. Ji ber ku mirov çiqasî li ser welatê xwe binvîse nikare mafê wî bidiyê nexasim welatekî wek welatê me di êş û azaran re derbas bûbê. Her wiha cûreyek din jî ez ji helbestê dinvîsim rexneye lê bi şêwazekî kenokî bi erebî jê re dibêjin elneqd elsaxir. Di demê pêş de xesteka min heye ku ez pêşketinên mezintir di warê nivîsa helbestê de bidest bixim û derfet çêbibe ku ez berhemên xwe çap bikim.”

**Yek ji helbestên Fayîq Hesen**

Helbestvan Fayîq Hesen axaftinên xwe bidawî kirin û wiha got: “Her herlbesteke min çîrokekî vedibêje û dema mirovekî ji helbestan fam bike bixwîne wê di kûrahiya her peyvekî de hestekî veşartî bibîne. Hin serenavên helbestên min ev in Zimanê kurdê, Şêra Birîdar,Hawara şengalê, Destana berxwedanê û Rabe kurdo. Her wiha ev yek ji helbestên mine;



**Destana Berxwedane**

Destana berxwedanê li şexmegsûd nivîstin
Elfebeya rometê evan lehengan diristin
Cîhanê Tevde bi çavan dit û hemayan jî bihîstin
Bi Hovî û pilanên qirêj li hember me çawa ristin
Bi kîn û bê dilovanî Dil ji laşan derxistin
Hetanî pakrewan jî ji qatên bilind avêjtin
Weke komika Seyan Li dor kombidbûn û dirawestin
Tevî ku laş bê can bû jî ji tiris û xofa wê dişkestin
Ev çi tirse ket dilê wan hişt ku li dor hev du geran Li hev kombidbûn bi hezaran
Bi diron û çekên giran hatin şerê sêsed kesan
Kî dîtiye di dîrokêde du dewlet bêne du taxan
Şervanê me şerkerin bi doza xwe bawerin
Ji bo welat Fedakerin Pîrozin kurdperwerin
Gavan paşdenavêjn nexwînmij û xwînrêjin aşitiyê dixwazin
Ji bo cîhanê dibêjn çi bêdengiyek bi şerme ya cîhane hember me
Ma ev e xelata qenciyê wekir berdêl xwîna me
Em ê hebin qet namirin
Her ku hene şervanê me
Şervan hemû Ziyadin
Axa Welat bernadin
Sitûyê dijmin dê badin bişehadetê dilşadin
Bila dijmin baş bizane em tuçarî ne wek wane
Em ne dişkin ne jî diçimin em ne ser şirê basane
Sembola me hertim ev e
Berxwedan jiyane

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER PERÎŞANÎ, BELENGAZÎ Û DEVJIXWEBERDANÊ**

**Bi xwe de aniye:**
- Dev ji xwe berdaye; xwe belengaz kiriye.
**Bi xwe de berdaye:**
- Bi heman wateyê.
**Çavbiewr e:**
- Tiştan baş nabîne; tiştan zû nabîne; ne jîr e.
**Çavewr e:**
- Bi heman wateyê.
**Çavkor e:**
- Bi heman wateyê.
**Çavgirtî ye:**
- Tiştekî nabîne; haya wî ji dinyayê nîne; belengaz e.
**Çavên wî tiştekî nabînin:**
- Bi heman wateyê.
**Çavşkandî ye:**
- Belengaz e; perîşan e; hatiye tirsandin; her kes dikare neheqiyê lê bike.
**Çavçil e:**
- Bi kêrî tiştekî nayê; belengaz e. Devê vekirî mêrga mêşan e:
- Perîşan e; nikare mêşan ji xwe bihemîne.
**Dev ji xwe berdaye:**
- Bêserûber e; tiştek ji bo wî ne girîng e; ji xwe xeyidiye; jiyan ji bo wî bêwate bûye; beredayî ye; bi kêrî tiştekî nayê.
**Giriyê kafiran li ser tê:**
- Rewşa wî pir nebaş bûye; pir belengaz bûye.
**Giriyê kafiran pê tê:**
- Bi heman wateyê.
**Girî jê kêm e:**
- Bi heman wateyê.
**Giriyê miriyan li ser dihat:**
- Ketibû rewşeke pir ne xweş.
**Kefen li ber xwe kiriye:**
- Xwe ji mirinê re amade kiriye; dev ji xwe berdaye; xwe belengaz kiriye.
**Ketiye ber destan:**
- Êdî nikare bixwe pêwîstiyên xwe pêk bîne; belengaz bûye; ketiye nexweşiyeke giran.
**Ketiye ber piyan/lingan:**
- Perîşan bûye; êdî nikare pêwîstiyên xwe pêk bîne; hin alîkariyê pê re dikin.
**Kûçik bi halê wî digirîn:**
- Pir belengaz bûye.
**Ji ser silê nikare biçe ser cilê:**
- Belengaz e; perîşan e; bi kêrî tiştekî nayê, nikare ji bin xwe rabe. (Ji gûyê mirovan re dibêjin sil)
**Li piştê bide nan ji devê wî derîne:**
- Mirovekî belengaz e; mafê xwe naparêze, xwelîser e.
**Mêş ji ber nafire:**
- Belengaz e; bêdesthilat e; bi kêrî tiştekî nayê.
**Mêşa wî miriye:**
- Belengaz bûye; êdî bi kêrî ti karî nayê; bêdeng bûye; derdekî wî heye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

**Sudoku: Bersiv 82**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 5 | 8 | 9 | 6 | 1 | 2 | 4 | 7 |
| 7 | 6 | 9 | 4 | 5 | 2 | 3 | 1 | 8 |
| 2 | 4 | 1 | 3 | 8 | 7 | 5 | 6 | 9 |
| 5 | 2 | 3 | 6 | 7 | 4 | 9 | 8 | 1 |
| 1 | 7 | 4 | 2 | 9 | 8 | 6 | 3 | 5 |
| 8 | 9 | 6 | 1 | 3 | 5 | 7 | 2 | 4 |
| 9 | 8 | 2 | 5 | 4 | 6 | 1 | 7 | 3 |
| 6 | 3 | 7 | 8 | 1 | 9 | 4 | 5 | 2 |
| 4 | 1 | 5 | 7 | 2 | 3 | 8 | 9 | 6 |

**Sudoku:Pirs 83**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | 3 | | | 1 | | |
| | 5 | | | | | | 8 | |
| | 4 | 1 | 7 | | 6 | 3 | | 5 |
| | | | 5 | | | | 3 | 6 |
| | 7 | | 6 | | 1 | | 2 | |
| 9 | 3 | | | | 4 | | | |
| 1 | | 5 | 2 | | 3 | 8 | 4 | |
| | 2 | | | | | | 5 | |
| | | 3 | | | 9 | | | |

## Salek komkujiyên Siwêdayê qediya, hîna gef û nearamiya Sûriyê didomin



Salek li ser êrişên Siwêdayê derbas dibe, lê hîn jî rewşa ewlehiyê li Sûriyê ne aram e. Nebûna dadmendî, lêpirsîn û hesabpirsînê, bi berdewamî metirsiya dubarebûna komkujiyan li dijî komên etnîkî û olî zêde dike. Aştiya domdar tenê bi parastina mafên mirovan û darizandina sûcdaran pêk tê.**R-4**

## Şêniyên Qamişlo: Navê Kobanê wê her wekî xwe bimîne



Şêniyên Qamişlo diyar kirin ku Kobanê bi xwîna şehîdan hatiye avdan û naskirin û wiha gotin: “Kobanê wê her tim bi navê Kobanê bimîne, em qebûl nakin ku navê herêmên Kurdî werin guherandin.”**R-7**

## ‘Ji bo diyarkirina buhayê nanê siyahî lêkolînên berfireh têne kirin’



Alîkarê Rêveberê Şaxa Nangehan li Hesekê, Rondar Salih destnîşan kir ku aliyên pêwendîdar ji bo diyarkirina buhayê nanê siyahî lêkolînên berfireh dikin û got, “Her guhertinek di buhayê nan de wê li ser bingeha lêkolînek berfireh be, berjewendiyên welatiyan û nangehan jî wê li ber çavan bê girtin.”**R-8**

## Yek ji dewlemendtirîn çandên herêmê: Çanda Suryanî



Çanda Suryanî mîrateyeke dewlemend û kevnar e ku ziman, kevneşopî, ol û hunerê dihewîne. Ev çand bi cilên xwe yên gelêrî, muzîka rûhanî û xwarinên xwe yên dewlemend tê naskirin, ew tevî dijwariyên dîrokî û koçberiyê jî, nasnameya xwe ya resen di nav çandên cuda de diparêze.**R-9**



**Bi hunerê parastina hiş**
Remezan Olçen R-9



**Kurd gihiştin sînorê azadiyê**
Berîtan Xalid R-2


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1393 12-Tîrmeh-2026 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

# REMZIYA MIHEMED: JINÊN KURD PIRA YEKÎTIYA DEMOKRATÎK AVA KIRIN

Hevseroka TEV-DEM’ê Remziya Mihemed diyar kir ku jinên Kurd bi rêxistinbûn, berxwedan û tevlîbûna xwe ya di hemû qadan de, bûne pêşengê avakirina yekîtiya demokratîk. Tecrûbeya Şoreşa Rojava nîşan da ku jin dikare ne tenê civaka xwe bi rêxistin bike, lê di asta Kurdistanê û cîhanê de jî dikare bibe hêza demokrasiyê, aştiyê û guhertina civakê.**R-2**




## Di dîrokê de berxwedaniya hin kesayetên navdar li hemberî desthilatdariyê



Ji destpêka ku desthilatdarî hatiye avakirin, destê xwe daniye ser hemû hêlên jiyana mirovan, di nav de jî rewşenbîr û fîlozof. Ji Suqrat bigire heya Galîleo, Imêl Zola, Aleksander Solcenitsyn, Ferec Foda û Rêber Apo, van kesayetên dîrokî serî li hemberî desthilatê netewandiye û bûne xizmetkarên azadiya civakê.**R-6**

# 'Jinên Kurd pêşengtî ji yekîtiya demokratîk re kirin'

Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Remziya Mihemed diyar kir ku jinên Kurd di xebata yekîtiya demokratîk de li seranserî cîhan û Kurdistanê roleke mezin lîstin û wiha got: "Jinên Kurd pêşengtî ji xeta yekîtiya demokratîk re kirin."

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Jinên Kurd di avakirin û belavkirina xeta yekîtiya demokratîk de li seranserî cîhanê roleke mezin lîstin, bi vê yekê re jinên Kurd karîbûn ku li hember pergala netew dewletê bibin pira yekîtiya jinan û xeta yekîtiya demokratîk di nava civakan de pêk anîn. Herwiha li hemberî sîstema desthilatdar bi rêxistinbûn û yekîtiya xwe yê demokratîk guhertinek çêkir.
Di vê çarçoveyê de Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Remziya Mihemed ji Rojnameya me re axivîn.





### 'Jinên Kurd yekîtiya demokratîk pratîkî kirin'

Remziya Mihemed destnîşan kir ku jinên Kurd karîbûn xwe di sîstema yekîtiya demokratîk de birêxistin bikin û wiha got: "Rola jina Kurd di yekîtiya demokratîk de hem di Şoreşa Rojava de, hem jî di tevahî Kurdistanê sereke bû, herwiha bû pêşang ji xeta yekîtiya demokratîk re. Di şoreşa Rojava de jina Kurd ev yekîtî paratîkî kir ku çawa jina Kurd bû şoreşger, şervan, gerîla, siyasetmedar û dîplomat. Di şoreşa Rojava de bi pêşengtiya jinê hêza YPJ'ê pêşket û bû hêza parastinê di nava civakê de. Gelek mînak û pêşengên jin di dîrokê de hene, lê ema naynê ser ziman wek; Zerîfe, Besê û hwd.. gelek jinên Kurd ku pêşangtî kirine hene, lê ji aliyê desthilatdaran ve hertim tên veşartin û paşguh kirin. Lê di Şoreşa Rojava de ev pêşangî li pêşiya raya giştî hate xuyakirin, jinên Kurd di hemû qadan de cihê xwe girt û roleke mezin di serkeftinê de lîstin.
Di yekîtiya demokratîk de dema ku li Rojavayê Kurdistanê şoreşê dest pê kir û di 19'ê Tîrmehê de çiruska yekemîn hate avêtin, jinê karîbû xwe di nav sîstema Rêveberiya Xweser de birêxistin bike û biparêz e. Jina Kurd bu pêşanga civaka xwe, li kêlekî wê jî ji hemû pêkhateyan re bû pêşeng. Jina Kurd ne tenê ji bo xwe tekoşîn û xebatê dimeşîne, lê belê hertim ji bo tevahî jinan tekoşînê dide meşandin, ev yek jî li pêşiya raya giştî tê kirin. Niha sîstema desthilatdar ya dewlet netew li hember gel û jinan qirkirinekê didin meşandin, êdî jin vê yekê qebûlnakin jin bi rêbazê xwe rêxistinbûyînê dikarin xwe ji tundiyê rizgar bikin. Dema ku tevahî jin bi reng û pêkhateyên xwe bên gel hevdu dikarin, li hember hemû siyasetan bisekinin."

### 'Divê jin di hemû waran de bibe xwedî biryar'

Remziya Mihemed daxuyakirin ku sîstema kûrewî li ser xeta jinê tê maşandin û wiha pê de çû: "Dema sîstema cîhanî dewlet netew be, wê xeta kûrewî li ser jinê jî di her warî de bimeşîne, di haman demê de siyaseta înkar, qirkirin û biçûkxistinê li ser jinê didin meşandin. Gelek dewlet hene, tenê jinê bi awayekî şeklî didin pêş ku jin dibin wezîr, rêveber, di sazî û dezgehên dewletê de cihdigirin. Ew jin ne temsîla xwe dike, lê belê temsîla dewletê û siyaseta wê dike, ew dewlet jî sîstema zayenperest û desthilatdariyê dide pêş ku xwe berpirsyar dibîne û jinê jî alîkar dibîne. Belkî di hinek dewletan de rê didin jinê ku di nava sîstemê de kar bikin, lê ew sîstem, rê û rêbazên ku ji aliyê dewletê ve ji jinê re tên dayîn nakevin xizmeta îrade û hebûna jinê.
Ev yek nîşan dide ku jinê tenê bi awayekî şeklî dixin nava saziyan, da ku xwe demokrat nîşan bidin, di vê dawiyê de hilbijartin li Amerîka de çêbû 8 jin hatin hilbijartin û di nava wezaretê de hatin bicihkirin, lê li beramberî wê şerê ku li cîhanê û Rojhilatê navîn tê meşandin, ecaba jin dikarin li hember wê şerî bisekinin, helwesta xwe di berlemanan de nîşan bidin û diyar bikin ku ew li hember vê şer disekinin û qebûlnakin ku kuştin çêbibe, lê belê pêwîste aştî çêbibe. Ev jî di sîstema dewletan de nayê nîşandan, dengê jinê di vê yekê de nayê diyarkirin ji ber wê jî sîstema cîhanî ya li ser jin heman rêbazî dimeşînin. Heya ku jin îradeya xwe temsîl neke, hebûn û xwebûna xwe nede diyarkirin wê ew zîhniyet hertim li ser jinan bê meşandin. Pêwîste ev rengê tenê şeklî ji jinan re tê dayîn em qebûlnekin, divê di pratîkê de were kirin û jin di hikumet, dewlet û parlemenê de bibe xwedî biryar."

### 'Sîstema cîhanî netekiye xizmeta parastina jinan'

Remziya Mihemed tekez kir ku ji bo jin li hember sîstema dewletê dernekeve wê biçûk dixin û wiha domand: "Ne tenê li Kurdistanê ango li Rojhilata Navîn şerê siyasî tê meşandin, lê belê tevahî cîhan di nava şer de ye. Ev şer bandora xwe ne li ser dewletan û sîstemê wê dike, lê belê li ser civakê tê kirin û di hundir civakê de jî li ser jinê tê meşandin. Dema ku zarok, hevjîn, birayê û malbetê jinê tê qetilkirin bandora vê yekê jî li ser jinê dike. Ji ber vê yekê sîstema cîhanî netekiye xizmeta parastina jin de. Hertim bi çavekî ne layiq li jinê meyze dikin da ku jin li hember sîstema wan dernekeve ji bo vê jî bandora asta tekoşîna jinan di asta cîhanî de diyar dibe. Israra jina Kurd ji bo demokrasî, wekehevî, azadî û aştiyê bandoreke mezin li cîhanê kir, ji bo vê jî êrişî li ser jinên Kurd tê kirin."

### 'Hêza jin dikare bêyî sîstema dewletê xwe rêxistin bike'

Remziya Mihemed da zanîn ku jina Kurd bi hêza xwe bandoreke mezin li cîhanê kir û wiha anî ziman: "Di van salên derbasbûyî de gelek komxebat, konferans û kongre di asta cîhanî û Rojhilata Navîn de çêdibin, ku têde tecrûbeya jina Kurd tê nîşqaş kirin, ku jina Kurd bandoreke mezin li cîhanê çêkirî û diyar dikin ku jinên Kurd hêzeke mezin avakirine bêyî ku tu dewlet û sîstem wê bimeşînin. Ev yek jî diyar dike ku hêza jin dikare bêyî sîyaseta dewletê jî xwe rêxistin bike, jina Kurdistanî bandoreke bi vî rengî di asta navnetewî û di nava jinên Ereb de çêkir. Jina Kurd bêyî ku sîsyaseta dewletê li ser bê meşandin dibe sîyasetmedar û dîplomat. Jina Kurd bû pêşeng û mînakeke ji tevahî jinan re, jinên Kurd ji felsefeya Jin Jiyan Azadî hêz girtine. Dema ku li her deverekê li cîhanê jin rastî tundî û qetilkirinê tê jinên Kurd helwestên xwe ji bo wê jinê nîşan didin. Ev jî bondora yekîtiya demokratîk e, ya ku jinên Kurd pêşengtiya wê dikin, jin dikarin bibin hêzek ji bo avakirina konfedarliyeke demokratîk li tevahî Rojhilata Navîn û Cîhanê. Jina Kurd di avakirina yekîtiya demokratîk de roleke mezin lîst, zehmetî û pirsgirêk gelek tên jiyan kirin, lê têkoşîn û israra jinan wê armanca wan misoger bike. Berxwedana jinan wê hertim biherike, berxwedan û têkoşîna jinan wê îradeya azad ava bike di heman demê wê yekîtiya demokratîk bide avakirin."

### 'Hêza jinê wê sîstema desthilatdariyê bide guhertin'

Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Remziya Mihemed axaftina xwe wiha bidawî kir: "Yekîtiya jinan di serî de jinên Kurd gelekî girînge ji bo ku em karibin yekîtiya netewî ya Kurdî avabikin. Herwiha di asta cîhanî de yekîtiya jinan wê azadiya jinan misoger bike, mafê jinan biparêze û birêxistinbûyîna xwe wê sîstema desthilatdariyê bide guhertin. Ji bo vê jî yekîtiya jinan li her derê gelekî girînge. Ji bo vê jî slav û hezkirinên me ji tevahî jinên têkoşer re ku cihê xwe li hemû qadan digirin heye û yên ku rastî tundiyê tên hişê me li gel wan em ê bi vê hêza wan ji tundiyê rizgar bikin. Bi taybet li Rojavayê Kurdistanê têkoşîneke bi vî awayî tê meşandin da ku Sûriyê ber bi demokratiyê ve biçe."

Ji Ramanên Jin



Bêrîtan Xalid

## Kurd gihiştin sînorê azadiyê

Şoreşa 19'ê Tîrmehê (Şoreşa Rojava) ku di sala 2012'an de li Kobanê dest pê kir, di dîroka Rojhilata Navîn de wekî "Şoreşa Jinê" tê naskirin. Jinan pêşengiya vê şoreşê kir û di avakirina pergala xweser de cih girt û bi têkoşîna xwe li dijî zihniyeta baviksalarî û çeteyan bûn sembola azadiyê.19'ê Tîrmehê di dîroka gelê Kurd û cîhanê de rojek taybet û dîrokî ye. 19ê Tîrmehê ji bo gelê kurd destpêka şoreşeke xwe avakirin û afirandinê ye. Şoreşa xwe parastin û rêxistinkirinê ye. Gelê kurd bi vê zanîn û kelecanê her sal Şoreşa 19ê Tîrmehê bi coş û kelecan pîroz dikin. Bi pêvajoya ku di 2011'an de dest pê kir û pê re, Tevgera Azadiyê gav bi gav ji bo Rojava, Bakurê Sûriyeyê û tevahiya Sûriyê û Rojhilata Navîn, proje pêş xist. Hemû rêyên din ku li Kurdan hatin ferzkirin qebûl nekir. Rêya sêyemîn esas girt û hilbijart. Her wiha li gorî wê xwe bi rêxistin kir. Vê tevgerê welatên wekî Îran, Tirkiye, Siûdî Erebîstan û Katar xistin nava tirsê. Di êrîşên li dijî gelên serî hildan de bi sedan kes hatin kuştin. Di rûpelên dîroka cîhanê de gelek mînakên serhildan û şoreşan hene. Gelek şoreş û serhildanên kurdan di dîrokê de cih girtine. Yek ji vanan Komara Mihabadê ye. Lê îro şoreşa 19ê Tîrmehê ku di nav rûyê dinyayê de nimûneya herî berbiçav û xurt e. Şoreşa ku karibû hemû pêkhateyan tev ol û mezhebên wan di hembêza xwe de di bin sîwaneke hevgirtî de bihewîne.19'ê Tîrmeha 2012an destpêka Şoreşa Rojava ye. Ji ber vê yekê wekî Şoreja 19ê Tîrmehê tê zanîn. Ev şoreşa ku di pêşengiya têkoşîna jinê de li Kobanê hat îlankirin, dibe hêviya tevahî karker, kedkar, ciwan, jin û gelên bindest. Şoreşa Rojava ku 13 sal li pey xwe hişt her sal li hemû cîhanê bi coşeke mezin tê pîrozkirin. Şoreşa Rojava ya ku li dijî çeteyên DAÎŞê ya ku dewleta Tirk xwedî kir bi berxwedana Kobanê navê xwe di dîrokê de da nivîsandin û di heman demê de bû şahîdê tevahî bindestên tevahî cîhanê. Ji welatên cuda bi sedan ciwanan ji bo parastina şoreşê di mewziyan de cihê xwe girtin û tevlî xebatên avakirina şoreşê bûn. Bi dehan şervanên enternasyonalîst ji bo parastina şoreşê canê xwe fidakirin.Şoreşa Rojava ku bingeha xwe ji Şoreşa 19ê Tîrmehê digre û ji bo hemû gelên cîhanê bûye çavkaniya hêviyê, ji bo hemû hêzên serdest jî bûye tirseke mezin. Hêzên şoreşa Rojava li dijî tevahî êrîşan xwedî hêz û vîna mezinkirina berxwedanê ne. Şervanên Bakur û Rojhilatê Sûrî yên wekî Xebat Dêrîk, Arîn Mîrkan, Sosin Bîrhat, Ferhad Erebo, Baran Serhed û Ehmed Şoreş ji bo parastina şoreşê heta dawiya dilopa xwîna xwe têkoşiyan û li ber xwe dan. Şervanên Kurd ji bo şoreşa Rojava û destkeftiyên wê biparêzin, bi dil, can û hemû hêza xwe ya maddî û manevî amadene ku heta wawî van nirxan biparêzin. Şoreşa 19ê Tîrmehê bi têkoşîn û berxwedana jin û ciwanên Kurd, Ereb, Suryan, Asûrî, Ermen û tevahî gelên herêmê pêş ket û gihişt lûtkeyê. Şoreşa Rojava îro ji bo hamû gelên cîhanê yên têkoşîna aştî, demokrasî û azadiyê didin ji bo wan dibe mîna fanosa ronahiyê.



# Koçberî û Penaberî dibe sedema dûrxistina mîlyonan zarokan ji xwendinê

Li çar aliyên cîhanê ji ber şer, belengazî, karesatên xwezayî, koçberî û penaberiyê bi mîlyonan zarok ji xwendinê hatine dûrxistin, ev yek ne tenê zarokan ji mafê wan ê xwendin û fêrkirinê dûr dixe, lê dibe gefeke domdar li ser pêşeroja wan û tevahî civakê.

**Navenda Nûçeyan**

Li gorî zagonên mafê mirovan û pîvanên civakî û exlaqî, xwendin û perwerdehî yek ji mafê bingehîn yên zarokan e. Lê belê gelek zarokên koçber û penaber ji vî mafê xwe yên bingehîn bêpar dimînin, ji ber nebûna dibistanan, kêmbûna amûrên perwerdeyê, pirsgirêkên zimanî yan jî şert û mercên dijwar ên jiyanê. Ev rewş siberoja wan dixe xeteriyê û derfetên wan ên jiyana baş, kêm dike.

### Ji ber şert û mercên dijwar bi mîlyonan zarok ji mafên xwe bêparin

Di cîhanê de koçberî û penaberî yek ji pirsgirêkên mezin ên mirovahiyê ne. Ji ber vê sedemê jî bi mîlyonan mirov neçar dibin welat û malên xwe bihêlin. Di salên dawî de jî, ji ber şer, nakokî, belengazî û karesatên xwezayî, koçberî û penaberî li cîhanê pir zêde bûye. Ev rewş bandoreke mezin li jiyana zarokan kiriye. Li gorî daneyên UNESCO, di sala 2025'an de nêzîkî 272 mîlyon zarok û ciwan di cîhanê de, ne di dibistanê de bûn. Di nav wan de mîlyonan zarokên koçber û penaber hebûn ku ji ber şert û mercên dijwar nikarîbûn xwendina xwe bidomînin.

### Li çar aliyên cîhanê gelek zarok jiyana xwe ya yasayî ji dest dane

Zarokên ku ji welatê xwe koç dikin an penaber dibin, gelek caran dibistan, heval û jiyana xwe ya asayî ji dest didin. Gelek ji wan li kampên penaberan an li deverên ku şertên jiyanê dijwar in dijîn. Li wir dibistan kêm in, mamoste têr nînin, pirtûk û amûrên xwendinê kêm in û gelek zarok jî zimanê welatê nû nizanin. Ji ber van sedeman, ew ji xwendinê dûr dimînin. Dûrxistina zarokan ji xwendinê tenê pirsgirêkeke îroyîn nîne, lê bandoreke demdirêj li siberoja wan heye. Zarokê ku nikare bixwîne, dibe ku di siberojê de karê baş peyda neke, belengazî zêdetir bibe û nikare beşdarî pêşketina civakê bibe. Herwiha zarokên ku ji dibistanê dûr dimînin, zêdetir di metirsiyên wekî karê zarokan, zewaca zû an îstîsmarê de rû bi rû dimînin.

### Daneyên herî nû yên UNESCO û rêxistinên Neteweyên Yekbûyî

Di 2025'an de li cîhanê 272 mîlyon zarok û ciwanên temenê dibistanê, ne di dibistanê de bûn. Ev hejmar ji ber şer, koçberî, penaberî, belengazî û faktorên din bilind bû.



Di 2026'an de, li gorî raporên herî nû, 93 mîlyon ji zarokên ku di rewşên qeyranê de dijîn bi tevahî ji mafê xwendinê bêpar bûn û 258 heta 273 mîlyon zarok û ciwan ji ber şer, koçberî û karesatên xwezayî, perwerdeya wan hatiye têkbirin.

### Alîkariya rêxistinên navnetewî ji bo vegera zarokan li ser rêya perwerdeyê erke bingehîne

Ji ber vê yekê divê hikumet, UNESCO, UNICEF û rêxistinên din bi hev re bixebitin, da ku ji bo hemû zarokan li tevahiya cîhanê derfeta xwendinê peyda bikin. Avakirina dibistanan, amadekirina mamosteyan, dabînkirina pirtûk û alavên xwendinê û piştgirîkirina malbatên koçber. Ev yek dikare bibe sedema vegera zarokan ji bo dibistanê. Ji ber ku parastina mafê zarokan bo xwendinê erkek e bingehîne. Heke îro alîkariya zarokan neyê kirin, wê siberoja wan winda bibe. Herwiha wê zanist û jêhatiyên wan jî winda bibin. Di encamê de xwendin mafek bingehîn e ku divê ji hemû zarokan re were parastin. Ger îro alîkariya zarokên koçber û penaber were kirin, wê siberojeke baştir ne tenê ji bo wan, lê herwiha ji bo hemû civakê bê avakirin. Parastina mafê xwendinê erkeke mirovahî û berpirsiyariya her kesî ye. Divê zarok ji metirsiyên cîhanê werin parastin û dûrxistin. Tenê siberojeke ronî ji bo wan were avakirin.

# Li Sûdanê ji destpêka salê ve 330 zarok bûne qerbaniyên şer

**Navenda Nûçeyan**

**Li Sûdanê ji ber şerê dijwar ê di navbera artêşê û Hêzên Piştevaniya Lezgîn de, zarok dibin qurbaniyên herî mezin ên vê qeyranê. Li gorî rapora UNICEF'ê ji destpêka salê û heta niha li Sûdanê zêdetirî 330 zarokan hatine kuştin û birîndar bûne.**

Rêxistina Neteweyên Yekbûyî ya Zarokan (UNICEF) di daxuyaniyeke femî de bîlançoya şerê ku li Sûdanê diqewime ji destpêka sala 2026'an û heye niha ve, eşkere kir. UNICEF'ê diyar kir ku herî kêm 330 zarok li Sûdanê di navbera kuştî û birîndaran hatiye tomarkirin û destnîşan kir ku ev nîşan dide ku xeterî li ser jiyana zarokan bi domandina şerê di navbera artêşa Sûdanê û Hêzên Piştgiriya Lezgîn de, mezin dibe.
Rêxistinê di daxuyaniyek fermî de diyar kir ku wîlayeta Darfur û Kerdevan rêjeya herî bilind a van qurbaniyan tomar kirine û destnîşan kir ku zarok di hundurê malên xwe de, li ser rêyan, li bazaran û dema ku hewl didin bigihîjin xizmetên bingehîn ên wekî perwerde û lênihêrîna tenduristiyê, dibin qurbaniyên tundûtûjiyê.
Li gorê UNICEF'ê rewşa li wîlayeta Kerdevana Bakur nîşan didin ku tenê ji Gulana 2026'an û vir ve zêdetirî 35 zarok hatine kuştin an jî birîndar bûne. Di nav lîsteyê de 18 zarokên ku hatine kuştin hene, di heman demê de zêdetirî 17 zarokên din jî birîndar bûne, ku temenê wan ji du mehî heta 17 salî bû.
Êrişên bi balafirên bêmirov wekî yek ji sedemên sereke yên vê xwînrijandinê derketin holê û ji sedî 60'ê hemû qurbaniyên zarokan li herêma Kerdevanê ne. Ev hejmar guhertinek xeternak di taktîkên şer de nîşan dide, ji ber ku her du aliyên şer zêdetir xwe dispêrin van balafiran, ku îsal bûne sedema kuştina zêdetirî 1000 kesan.



### Hişyariya sor derbarê bajarê El-Ebeyid de

Bajarê El-Ebeyid, paytexta wîlayeta Bakurê Kerdevanê, bi hefteyan e rastî bombebarana bênavber ji aliyê Hêzên Piştgiriya Lezgîn ve tê, ku binesaziya sivîl a girîng, di nav de stasyonên elektrîkê, torên avê û dibistan hedef digire, herwiha xetên dabînkirinê qut dike û êşa gel zêde dike.
Di pêşketineke xeternak de, Neteweyên Yekbûyî "hişyariya sor" da û hişyarî da ku Hêzên Piştgiriya Lezgîn amadekariyên êrişeke berfireh li ser bajarê ku nêzîkî nîv milyon sivîl lê dijîn, dikin.
Tirsên dubarekirina hovîtiya ku di Cotmeha 2025'an de li El Faşir li herêma Darfûrê çêbûn, zêde dibin, ku lêkolîneke berê ya NY encam da ku "nîşanên qirkirinê" di nav xwe de hildigirt.

### Xaleke xerab a tundûtûjî û bêpariyê

Nûnerê UNICEF'ê li Sûdanê Sheldon Yett, rewşê wekî "xaleke xerab a tundûtûjî, koçberî û bêpariyê" bi nav kir û tekez kir ku gelek zarok êdî cihekî ewle ji bo wan nema ye û wiha got: "Divê zarok qet nebin hedef, divê jiyan, maf û pêşeroja wan were parastin."
Bandorên şer ne tenê bi windahiyên rasterast ên mirovan ve sînordar in, lê di heman demê de zirarên giran dighîne malan, navendên tenduristiyê û bazaran jî, ku hestên tirs û şokê di nav kesên ku sax mane de zêde kiriye, nemaze li civakên ku bi pêlên bombebaran û koçberiyê yên li pey hev re rû bi rû mane.

### Binpêkirinên mezin û krîzeke birçîbûnê ya giran

Rêxistinê hişyarî da ku zarok rastî binpêkirinên cidî tên, ku ji kuştin û birîndarkirinê wêdetir diçin, di nav de leşkerkirin û bikaranîna bi darê zorê, revandin, şîdeta cinsî herwiha êrişên berdewam li ser dibistan û nexweşxaneyan.
Hejmarên NY aliyên karîsatbar ên krîza mirovî eşkere dikin, ku nêzîkî 5 milyon zarok li seranserê Sûdanê koçberên navxweyî ne. Di demekê de ku bi milyonan kes bi gefa birçîbûnê re rû bi rû ne, zêdetirî 825 hezar zarokên di bin temenê pênc salî de ji kêmasiya xwarinê ya tund dikişînin.
UNICEF'ê bang li hemû aliyên şer kir ku tavilê pabendî parastina sivîlan û binesaziya sivîl bibin û hemû tedbîrên pêwîst ji bo parastina zarokan ji zirarê bigirin.
Hêjayî gotinê ye ku şerê ku ji Nîsana 2023'an û vir ve li Sûdanê di navbera artêş û Hêzên Piştgiriya Lezgîn de diqewime, bi deh hezaran kesan jiyana xwe ji dest daye, di heman demê de rêxistinên alîkariyê yên navneteweyî hejmara miriyan bi zêdetirî 200 hezar kesan texmîn dikin, di nava astengiyek li eniyên şer ên bejahî û veguherînek ber bi şerê tunekirinê bi rêya êrişên hewayî ve.

# Sûriyê û pêşeroj: Nexşeyeke nû di bin mîkroskopa guhertinê de

**Cemîl Xoce**

Rojhilata Navîn, bi taybetî Sûriye û Libnan, derbasî qonaxeke gelekî hestiyar dibin. Rewşa siyasî li wir ne wekî berê ye. Em li hemberî rastiyeke nû ne ku nexşeya bandorê tê de tê nûkirin û rol diguherin. Di vê çarçoveyê de, gelo tiştên ku li piştperdeyê diqewimin û tiştên ku li benda herêmê ne çi ne? Ev pirs di serê her kesî de digerin û ji bo bersivdana wan xwendineke kûr a rewşê pêwîst e.

**Hevdîtina li Enqereyê: Bêdengî li hemberî bahozê**

Hevdîtina dawî ya di navbera serokê Amerîkayê Donald Trump û serokê qonaxa veguhêz ê Sûriyê Ehmed El-Şera de li Enqereyê, ji bo siyaseta herêmî bû xaleke werçerxê. Cîhanê temaşeyî dîmenekê kir ku tê de El-Şera gelekî tengav û di bin zextan de bû. Trump bi bawerî behsa Golanê û tawîzan kir, di demekê de ku El-Şera nekarî peyveke nerazîbûnê jî bike. Ev dîmen bi zelalî rewşa qelsî û girêdayîbûna ku desthilatdariya veguhêz a niha tê de dijî, nîşan da.

Hinek hewl didin vê yekê wiha şîrove bikin ku Sûriye ne xwediyê şiyana leşkerî ye ku rûbirûyî Trump bibeji ber vê bêdengî bijarteya rizgarbûnê ye. Lê siyaset tiştekî din dibêje: Serwerî xeta sor e ku bazar lê nayê kirin e. Dema ku rûmeta serweriyê dikeve, her tişt li hemberî hêzên navneteweyî dibe rewa. Serdan ne ji bo xurtkirina dewleta Sûriyê bû, lê ji bo çespandina rastiyeke nû bû, ku tê de “kesê hatiye tayînkirin” ango El-Şera rêwerzan werdigire û bêyî nîqaşan pêk tîne.

**Ewlekariya hejandî û binpêkirinên berfireh**

Ger em li hundirê Sûriyê binêrin, em têkçûneke ewlehiyê ya mezin dibînin. Teqînên ku Şam û derdora wê dihejînin, ne tenê bûyerên demkî yan tesadufî ne. Ew peyamên xwînî ne ku nîşan didin ku saziyên ewlehiyê ji aliyê dijberên vê desthilatdariyê ve heta hestiyan ketine nava wê de. Nakokiyeke veşartî û eşkere di navbera komên curbecur de heye, wekî “Ketîbeya Xerîban”, DAIŞ û hêmanên din, ku hemû ji bo kontrolê pêşbaziyê dikin û qelşên ewlehiyê ji bo zextê li ser desthilatdariya veguhêz bi kar tînin.

Ev têkçûna ewlehiyê derewên aramiyê yên ku desthilata veguhêz bi rêya medyayê propagandaya wê dikin, eşkere dike. Desthilata veguhêz heta niha nekarî ewlekariya welatiyên xwe biparêze, ne jî ewlekariya mêvanên xwe yên siyasî. Ev rewşa bêserûberiya ewlehiyê delîlekî yekalîker e ku “Îslama Siyasî” di avakirina dewleteke aram de têk çûye. Li şûna dadmendî û qanûnan, em toledanîn, kuştin û revandinê dibînin, ku ev yek êşa xelkê zêde dike, yên ku niha di tirs û nezelaliyekê de dijîn.

**Tirkiye: Mîratgirê nû yê bandorê ye**

Tiştê ku bi rastî balê dikişîne, zêdebûna rola Tirkiyê bi awayekî berbiçav e. Wisa xuya dike ku Tirkiye dest bi dagirtina valahiya stratejîk a ku Îranê li herêmê hiştiye, kiriye. Plandariyeke navneteweyî ya zelal heye ku armanc jê belavkirina tewereya Îranê ye û Tirkiye ew lîstikvan e ku ji bo vê erkê dijwar hatiye hilbijartin. Tewra destwerdana di karûbarên Libnanê de û ew tiştê ku tê gotin ku “Trablûs” ser bi bandora Şamî ya nû ve ye, beşek e ji avakirina hevsengiyên ku xizmeta ajendayên tirkî û rojava bi hev re dikin.

Cezayên li ser Tirkiyê hatin rakirin û derî jê re hatin vekirin da ku bigihêje teknolojiya leşkerî ya pêşketî wekî balafirên “F-35”. Di berdêlê de, tê payîn ku ew paqijkirina ewlehiyê bike û qaîdeyên lîstikê li Şam û Beyrûtê biguherîne. Mijar êdî ne têkildarî rûmeta dewletan e, lê bi berjewendiyên mezin ên jeostratejîk ve girêdayî ye. Tirkiye berfireh dibe û armanc dawîanîna bandora dijberên kevneşopî û çespandina lingên hevalbendekî nû li herêmê ye.

**Xewna aramiyê Xeyaleke mezin e**

Gelek kes behsa xwesteka navneteweyî ya ji bo aramkirina Sûriyê dikin. Lê gelo ev rast e? Ger civaka navneteweyî bi rastî bixwesta aramî çêbûya, dê destwerdanên li başûrê Sûriyê rawestandibûna, welatê ku ji ber şeran wêran bûye ava kiribûna û berpirsên tawanên mezin darizandibûna. Rastî ew e ku bala navneteweyî li ser berjewendiyên dewletan e, ne li ser aramkirina gelan an avakirina welatan e.

Şîrketên mezin dixwazin di enerjî û gazê de veberhênanê bikin. Dewlet dixwazin ewlekariya sînorên xwe misoger bikin. Sûriye îro ji bo wan ne welat e, lê girêka rêyên bazirganî û leşkerî yên girîng e. Ji ber vê yekê, ew wan navçeyên aloz hiştine, ji ber ku alozî xizmeta projeyên parçekirinê yên li ser bingehê mezhebî û etnîkî dike.

# Nato 3-0

**Voqan Elî**

Taybetmendiyeke şaristaniya madî, yanî şaristaniya resmalî, hemû dewletên wekî DYE, dewletên yekîtiya Ewrûpa û hemû pergalên kedxwar û dagirker e: Hez dikin ku tiştan-hebûnan ne li gorî maneya ku hildigire lê bi hejmarên bê ruh û ne xwediyê ti maneyekê bi nav bikin.

Vaye îsbateke din a vê; Civîna Nato 3-0. Temam, dezgeha Nato’ya berê her kes dinase û nas dike! Lê ev ya dawî ji ku derket? Ya destpêkê li dijî Sowyetê (Pewmana Warşovayê) hatibû avakirin û gihaşt armanca xwe… Ya duyemîn bi tasfiyeya hemû tesîrên sosyalîzma pêkhatî li Rojhilatê Ewrûpa û cîhên din ên cîhanê jî gihaşt armanca xwe. Ji ber vê yekê li paş deriyan biryar dan ku (li vê civîna Enqereyê) Nato 3-0 bi formata bê ruh a hejmaran ava bikin! Dema dezgeha Natoyê gihaşt armancên xwe yên esasî, ew bi xwe êdî bû tiştekî ne hewce! Diviyabû formata wê bihat guherîn. Vaye çîroka civîna li Enqereyê vê dike armanc. Lê ew ê di çi astê de bigihîje hedefên xwe yan jî hedefên wê dê çawa werin diyarkirin, pir ne zelal e. Li ser vê mijarê ponijîn jî ne karê me ye ku em xwe pê biwestînin.

Lê dema gelên cîhanê êş û karasatên hatine serê wan bi nav dikin: mînak, Ermen ji jenosîda mezin re ku di 1915’an de hatiye serê wan, dibêjin ‘Metzien’. Dîsa Asûrî-Suryanî ji tevkujiyên bi serê wan de hatine re dibêjin ‘Seyfo’. Kurdên Elewî yên Dêrsimî ji jenosîda 1937-39’an re dibêjin, ‘Tertele’. Yanî gotinên ku rasterast maneya êş û azarên kişandine ji me re radigihînin. Bi heman awayî kêfxweşiyên xwe jî wisa… Cejna Remazanê, Cejna Newrozê û hwd…

Niha di dîroka de (7-8’ê Tîrmehê) li payitexta Tirkiyê-Enqere civînek girîng dest pê kiriye û hê didome. Jêre çend hefte mabûn ku dest pê bike li ser naveroka wê qederek tehlîl û analîz hatin kirin. Ji beriya ku ev pêvajoya şênber bibe Jî nîqaşên li ser dê bidomin. Heta piştî wê jî de ev nîqaş werin domandin. Jixwe hêzên ku tevlî civîne bûne, ew ê hemû biryar nîqaşên hatine meşandin yekser nedin derve lê dema ku dor hate jiyanî kirina van nîqaş-biryaran jî dê ji ber xwe were fêmkirin ku çi tişt in.

Ev qada tehlîl û analîzên li ser naveroka vê civînê; ji aliyê alîgirên Erdoğanê ve wekî ku girîngiya stratejî ya bêyî wê nabe ya Tirkiyê hatiye fêmkirin Emerîka neçar maye ku li Rojhilata Navîn bi dewleta Tirk re tevbigere û heta mifteyê NATO 3-0’ê bide wan tê şîrovekirin. Aliyê duyemîn ku ev aliyekî pir berfireh, bi giştî girîngî dide tiştê ku DYE (Trumpî) ji Tirkiyê bistîne. Dibe ku pir hûrguliyên cuda yên vê tehlîlê hebin lê dişibe rola Tirkiyê ya di NATO’yê de ya ji beriya salên 2000’î. Yanî Tirkiyê dê bibe qereqola sereke ya Amerîka-NATO ya li Rojhilata Navîn. Lê ev nayê maneya ku hûrguliyên pêk werin ne girîng in: mînak, Trampî soz daye ku çend F-35’an û 50-60 motorên jet bide Erdoğan û hwd. Eger Trumpî karibe her du meclisên DYE’ê îqna bike dibe ku ev tişt çêbibe. Lê dîsa jî Erdoğan bêyî ku berdêla vê bide nikare xwe ji Trumpî xelas bike!

Di vê kêliyê de ku roja duyemîn a civîna NATO’yê hê jî didome li gorî hin ajansên cîhanî Trumpî agirbesta heyî ya bi Îranê re xelas kiriye û dibêje; “Agirbest ji ber Hurmuzê xelas bûye.” Jixwe ji beriya demeke kurt CENTCOM’Ê got ku wan êrîşê çend deverên li Îranê kirine. Yanî çi? Tehlîla vê rewşê bi du şiklan kirin mimkun e. Ya yekê vê di civîna navborî de yan meyleke giştî derketiye holê ku li cem Trumpî û li dijî meleyên Îranê her dewleta NATO’yê şûrê xwe bikişîne û yan jî ev bi hin dewletên esasî sînordar maye. Ya duyemîn; lobiyên Cuhiyan yan bi xweşî yan jî bi hin rêbazên taybet piraniya hêzên cîhanî û di serî de Trumpî îqna kirine-neçar hîştine ku şerê li dijî Îranê were domandin. Sibê du sibe kîjan ji van nêzîkî rastiyê derdikeve yan jî bijarteyeke din derdikeve li pêş me, nayê zanîn. Kîjan ji van, di kîjan astê de pêk were jî pir zehmet e ku matem-şîna Xemeneyê gornebihuştî bi sukutî derbas bibe. Yanî pir zehmet e ku pergala meleyên Îranê ku li ser gelên Îranî bûye xewnereşkeke ripûreş xwe li ser lingan bigire. Ev nayê maneya ku gelên bêguneh ên Îranî hewce ye alîkarî bidin şerxwazî û xwînrêjiya Trumpî û hogirên wî:

Riya gelên cîhanê timî li pêşberê şerên dagirkeriyê û xwînxwariyê diyar e. Riya sêyemîn… Mînak, niha li Îranê hêzên desthilatdar şer-rûdiya xwe li ser hemû gelên Îranî bi navê civaka Fars dimeşînin. Lê di rastiyê de ti berjewendiya gelê Fars jî têde tineye. Ji beriya ku qaşo ev meleyên bi Îslamê re ti eleqaya wan tineye şoreşa gelên Îranî bi alîkariya Franse û dewletên din ên Ewrûpayê bixeniqînin û darê sêdarê bibe para gelên Îranî (ji ber ku Xumeynî li binê baskê Franseya mezin bû), ev welat bi çand-seqafet û wêjeya xwe dihate nasîn: Şaîrên wekî Behrengî û teolog-sosyologên bijartê yên wekî Elî Şerîatî hemû li binê tava vî welatî mezin bûne. Lê niha li vî welatê wekî bihuştan tenê celadên ku benê îdamê dixe stuyê keç û xortên ciwanmerd ên gelan serwer in.

Di rojê pêş me de gelê Kurd, gelê Fars, gelê Belûc û çendîn gelên din bi têkoşîneke hevpar dê hem çarenûsa xwe û hem jî çarenûsa vê pergalê diyar bikin. Wê demê dê heq û neheq cihê xwe bibîne!



# Welatiyên Dêrikê: Gelê Kurd tayînkirinên perlemantoya Sûriyê red dike

**Welatiyên bajarê Dêrikê diyar kirin ku endamên parlementoyê hatine tayînkirin, lê mafê dengdanê yê rasterast ji gel re nehatiye dayîn, ev yek cihê metirsiyê ye ku di demên pêş de mafê netewan were paşguhkirin.**

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

Piştî rûxandina rêjîma Baas, Sûriyê ket qonaxeke nû ya avakirina saziyên dewletê, di vê çarçoveyê de avakirina Meclisa Gel(Parlamentoya Veguhêz) wekî pêngava herî krîtîk a vê serdemê derketiye pêş. Ev parlamento ku ji 210 kursiyan pêktê, êdî ne li gorî sîstema berê ya yek-partî, lê li gorî rênîşander û mekanîzmayên nû yên hikumeta demkî hatiye amadekirin. Lê belê, awayê diyarkirina endamên vê parlamentoyê ku bêtir dispêre tayînkirin û hilbijartina nerasterast, gengeşiyeke germ di nav civakê de daye destpêkirin.

Di derbarî tayînkirina endamên parlementoyê û bi taybet nûnerên ku qaşo temsîla gelê Kurd dikin welatiyên bajarê Dêrikê bi navê Fatima Hemdî, Selama Hacî û Elî Orîyan ji Rojnameya me re axivîn.



**‘Em Ebdulhekîm Beşar û hevalbendên wî qebûl nakin’**

Welatiya bi navê Fatima Hemdî anî ziman ku hikumeta demkî Ebdulhekîm Beşar li ser navê gelê Kurd tayîn kiriye, ew kî ye, wê çi bike û kî biparêze, ji milê kî ve çûye, yek Kurd jî ne li pişta wî ne û wî qebûl nakin tenê çend kesên wek wî li dora wî ne û wiha got: “Em wek malbatên şehîdan Ebdulhekîm Beşar û hevalbendên wî qebûl nakin. Kurd ne ew Kurdên berê ne, di dema berê de dewlata Tirk Kurd dixistin di nav şeran de û welat rizgar dikirin û ew dixapandin, bêpar dihiştin û ew di komkujiyan re derbas dikirin. Em li ser fikir û ramanên Rêber Apo hatine perwerdekirin, tu kes nikare rê li pêşiya me bigre. Me ev welat bi xwîna zarokên xwe parastiye bi saya şehîdên me hikumet silavê li kesê wek wan dike, ev kes ji milê dewleta Tirk ve hatine tayînkirin û tu navê Kurdayetiyê bi wan re nîne û tu tişt ji bo Kurdan jî nekirine.”

Fatima Hemdî axaftinên xwe berdewam kirin û wiha got: “Mihemed Ismaîl digot ku wî bi aqilê xwe ev welat parastiye, bila cîhan tev were û bêje gelo Mihemed Ismaîl çi kiriye, ew nikare parastina gundê xwe bike wê çawa vî gelî biparêze. Ez bang li gelê Kurd ên li çar parçeyên Kurdistanê dikim ku ji van kesê wiha bawer nekin û bi wan neyên xapandin. Pêwîst e gelê Kurd destê xwe bikin destê hev û yekîtiya xwe ava bikin da ku bikaribin kesên xapînok ji nav xwe derxin.”



Fatima Hemdî



Selama Hacî



Elî Oriyan

**‘Gel Kurd tayînkirinên perlemantoyê red dikin’**

Welatiya bi navê Selama Hacî da zanîn ku tayînkirinên ku ji hêla hikumeta demî ve hatine kirin nayên qebûlkirin û wiha got: “Kesên ku li ser navê Kurdan hatin tayînkirin di perlemanê de em wan red dikin ji ber ku ew kes ne ked dane ne jî şer kirine ne jî xwîn rijandine. Ebdulhekîm Beşar bi salan e dibin destê dewleta Tirk de ye û heman zihniyet difikire niha jî xwe li ser Kurdan hesab dike. Yek Kurd ne wî, ne jî zihniyeta wî qebûl dike, Ebdulhekîm li pêşiya her kesî derket û got dema ez mafê Kurdan nedim wan min bi girêfata min bixeniqînin, lê ev yek hemû lîstok in, dixwazin gelê Kurd bixapînin. Rojekî tenê jî nehatine di nav gelê Rojava de û ne jî li rewşa wan pirsîne wê çawa mafê wan biparêzin.”

**‘Berê xwe didin Şamê ji bo berjewendiyên xwe’**

Elî Oriyan diyar kir ku herkes dizane kesên wek Ebdulhekîm Beşar berê xwe dana Şamê ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî tevdigerin û wiha got: “Derdê wan ne Kurd in ne jî xwîna şehîdan e, tenê yek derdê wan heye ew jî bidestxistina kursiyan e. Kesê wek wan dixwazin gel bixapînin û li gor xwe gel birêve bibin, lê pêwîst e gelê Kurd ji lîstokên van kesan re hişyar be û baş bînin bîra xwe ku Ebdulhekîm Beşar û Mihemed Ismaîl berî niha siyaseta reşkirina gelê Kurd didan meşandin.”

# Çima dewleta Tirk dadgehkirina Îmamoglu li paş dixe?

**Navenda Nûçeyan**

**Pênc car in ku dewleta Tirk dadgehkirina serokê Şaredariya Istenbolê Ekrem Îmamoglu li paş dixe. Gelo çima dadgeha Tirkiyê vê siyasetê li hemberî namzedê hilbijartinên 2028’an ê herî xurt ku li pêşberî Erdogan e, bi kar tîne?**

Dadgeha Tirkiyê di 6’ê Tîrmehê careke din danişîna dadgeha serokê Şaredariya Stenbolê yê girtî, Ekrem Îmamoglu, di doza ku bi tawanbara sextekirina belgeya zanîngehê ve girêdayî ye, li paş xist. Ev cara pêncemîn e ku ji destpêka vekirina dozê pêktê, ev yek jî di Cotmeha 2025’an de hat paşxistin.

Dadgehê roja 25’ê Berfanbara bê wekî dema rûniştina yekem ya dadgehkirinê destnîşan kir. Îmamoğlu ji Adara 2025’an ve di zindanê de ye, bi tawanbarîyên gendeliyê tê dadgehkirin, lê ew van tawanbariyan red dike. Herwiha ew ji bo gelek dozên din jî li ber dadgehkirinê ye.

Îmamoglu, endamê Partiya Gel a Komarparêz (CHP) yek ji kesayetiyên herî girîng ên opozîsyonê û namzedekî muhtemel e ku dikare di hilbijartinên serokatiyê yên sala 2028’an de li hemberî Erdogan pêşbaziyê bike. Lê belê belgeya wî ya zanîngehê ya ku tê gotin sexte ye, bi biryara rêveberiya Zanîngeha Stenbolê dikare şansê wî yê namzedbûnê asteng bike.

**Dibe ku bi cezayeke mezin re rû bi rû bimîne**

Serokê Şaredariyê yê girtî di vê dozê de bi cezayek ku dikare bigihîje 8 sal û 9 mehan jî rû bi rû ye. Di heman demê de, paşxistina dadgehê hate kirin û ew di Girtîgeha Silivri ya li rojavayê Stenbolê de bi berdewamî tê dadgehkirin.

Di yek ji hevdîtinên dadweriyê de, Îmamoglu bal kişand ser hevdemiya dadgehkirina xwe bi amadekariyên lûtkeya NATO’ya li Enqerayê û da zanîn ku pirbûna dozên ku li dijî wî hatine vekirin, hedefgirtina siyasî ye. Di heman çarçoveyê de medyayên opozîsyonê ji devê endamê Parlamentoya Ewropayê û raporterê taybet ê Tirkiyê Nacho Sánchez Amor ku di danişîna dadgehê de amade bû, da zabîn ku Îmamoğlu neçar e li pêş sê dozên cuda were, ya yekem doza gendeliyê, doza ajantiyê û doza sextekirina belgeya zanîngehê.

Ji aliyê din ve, raporên rojnamevanî yên Tirkiyê ragihandin ku beriya lidarxistina lûtkeya NATO’yê li Enqerayê, di gelek bajarên Tirkiyê de siyaseta desteserkirinê zêdebûye. Ev yek di dema ku nîqaşa siyasî û dadwerî derbarê doza Îmamoglu de hîn jî li nav qada siyaseta Tirkiyê berdewam e, pêktê.

**Opozîsyon ji Lûtkeya NATO’yê ji bo rojevkirina doza Îmamoglu sûdê werdiger**

Opozîsyona Tirkiyê ji lidarxistina civîna Lûtkeya NATO’yê li Enqerayê sûd werdigire da ku careke din gelek mijarên navxweyî yên nakok, di serê wan de jî doza serokê Şaredariya Stenbolê Ekrem Îmamoglu bixe rojevê, ji ber ku Îmamoglu yek ji kesayetên girîng ên opozîsyonê û dijberê muhtemel ê Erdogan di hilbijartinên 2028’an de tê hesibandin.

Li gorî aliyên opozîsyonê, dema siyasî ya hestiyar a lûtkeyê fersendeke mezin bû ji bo zêdekirina zextê li ser hukumetê, bi taybet di bin şertên ku dadgehkirinên li dijî Îmamoglu hîn jî berdewam in û dozên wî care bi care têne paşxistin, ev yek jî dikare bandorek mezin li ser pêşeroja wî ya siyasî bihêle.



Îmamoglu ji rûniştinên dadgehê sûd wergirt ji ber ku hevdemî Lûtkeya NATO’yê, wî jî ev yek bi kar anî da ku rexneyên rasterast li desthilatdara Tirkiyê bike, ji ber ew dibêje pirbûna dozên li dijî wî armanca siyasî nîşan dide. Di heman demê de bi rêya platformên medyayî pirsî ka wêneyê Tirkiyê li ber çavên mêvanên navneteweyî çawa xuya dibe.

Ji aliyê din ve, kesayetiyên opozîsyonê di nav wan de rêveberên CHP daxwaz kirin ku di civînên serokên rojava bi desthilatdarên Tirkiyê re mijarên mafên mirovan û serweriya dadgeriyê jî bên gotûbêjkirin. Wan hişyarî da ku divê ev mijar ji bo hevkariya ewlehî û leşkerî ya di çarçoveya NATO’yê de neyên paşguhkirin.

Opozîsyonê rexne li kampanyayên ewlehiyê û girtinên ku beriya lûtkeyê li dijî rojnamevanan, çalakvanan û kesên opozîsyonê hatine meşandin kir û wan wekî beşek ji siyaseta qeydkirina azadiyê bi nav kir. Bi vî awayî, opozîsyonê dixwest zexma siyasî ava bike di demeke ku lûtkeya NATO’yê de tê lidarxistin û bi rêya wê nakokiyên xwe bi hukumetê re bide xuyakirin, doza Îmamoglu û mijarên azadiyên siyasî careke din bixe ber çavê raya giştî ya navneteweyî.

# Salek komkujiyên Siwêdayê qediya, hîna gef û nearamiya Sûriyê didomin

Salek li ser êrîşên Siwêdayê derbas dibe, lê hîn jî rewşa ewlehiyê li Sûriyê ne aram e. Nebûna dadmendî, lêpirsîn û hesabpirsînê, bi berdewamî metirsiya dubarebûna komkujiyan li dijî komên etnîkî û olî zêde dike. Aştiya domdar tenê bi parastina mafên mirovan û darizandina sûcdaran pêk tê.

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Piştî hilweşîna rêjîma Eseed di Kanûna 2024'an de valahiya ewlehiyê li Sûriyê pêk hat, bi vekê ji aliyê komên bi ser hikumeta demkî ve zextên li ser netewan zêde bûn. Êrişên li ser civaka Durziyan li Sûriyê piştî guhertinên siyasî û leşkerî yên dawî bi taybetî piştî ketina rêjîma Eseed zêde bûne. Pêkhateya Durzî li herêma Siwêyda û derdora wê rastî êrişên komên çekdar û hêzên cuda tên. Bi taybet di Tîrmeha 2025'an de, li parêzgeha Siwêdayê komkujiyên li dijî civakên Durzî û Bedewî li Siwêdayê pêk hatin ku li gorî komîteya lêpirsînê ya hikumetê jî di encamê de herî kêm hezar û 760 kes hatin kuştin.

### Bûyer ne tesadufî bûn bi paln bû

Bûyerên bi êş ên ku di sala 2025'an de li Sûriyê pêk hatin, ne kesan e yên serbixwe an jî tesadufî bûn. Ev bûyer piştî guherîna mezin a siyasî ya li welêt dest pê kir. Di 7'ê Kanûna 2025'an de rêjîma Baasê ku bi dehê salan li ser desthilatdariyê mabû hilweşiya û li şûna wê hikumeta demkî hat ser desthilatdariyê. Gelê Sûriyê hêvî dikir ku vê guherînê dê qonaxeke nû ya aramî, dadperwerî û hevjiyanê dest pê bike. Lê di demeke kurt de eşkere bû ku gelek herêm hîn jî di nav alozî, şer û tunebûna ewlehiyê de ne.

### Di çend mehan de gotinên rojên destpêkê bi hilweşandina maskan hate eşkerekirin

Çend meh piştî hatina hikumeta demkî, gef û êriş li ser gelek komên civakî yên Sûriyê dest pê kir. Di serî de, li Berava Sûriyê hêzên çekdar û komên ku bi navê hêzên ewlehiya giştî dixebitîn, bi hinceta "paqijkirina bermahiyên rêjîma Baasê" operasyonên tund li dijî gelê Elewî kirin. Di encama van operasyonan de bi hezaran sivîl hatin kuştin, gelek kes birîndar bûn û hezaran malbat neçar man ku ji mal û warên xwe koç bikin. Ev trajedî di 6'ê Adara 2025'an de li Berava Sûriyê pêk hat û ji aliyê gelek aliyên mafên mirovan ve wekî yek ji bûyerên herî xwînmij ên wê demê hate binavkirin. Çend meh piştî van bûyeran, di 12 û 13'ê Tîrmeha 2025'an de Siwêdayê jî bû şahidê heman siyaseta tundûtûjiyê. Gelê Durzî rastî êrişên çekdar, kuştin, tirsandin û hewldanên têkbirina ewlehiya civakî hat. Piştî gelê Durzî li ser herêmên Kurdan û Rêveberiya Xweser a ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê êriş pêk hatin ku ev êriş di 6'ê Çileyê de li bajarê Helebê bi taybet li ser taxên Kurdan Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dest pê kirin û ber bi bajarên dîtir ve hatin, herî dawî ev êriş bi îmzekirina Peymana 29'ê Çileyê bidawî bûn. Lê van bûyeran careke din nîşan da ku gelek komên etnîkî û olî yên li Sûriyê hîn jî di metirsiyeke mezin de dijîn û nikarin xwe ewle hîs bikin.

### Çend qonaxên êrişên li ser Siwêdayê

Destpêkirin êirşnan 11 û 13 Tîrmeha 2025'an: Kirîz piştî dizî û êrişeke mezhebî ji aliyê endamên eşirên bedewî ve li dijî bazirganekî sebzeyan ê Durzî li ser rêya Şam û Siwêdayê dest pê kir.

12'ê Tîrmehê: Komên Druz bi revandina endamên eşiran bersiv dan, da ku zextê bikin da ku kelûpelên dizîne vegerînin, di encamê de rewş zû veguherî revandinên beramberî hev.

13'ê Tîrmehê li bajarê Siwêdayê û gundên derdorê, di navbera herdu aliyan de şerên çekdarî yên tund û vekirî dest pê kirin. Destwerdana leşkerî û lûtkeya xwînî nîvê Tîrmeha 2025'an Pêla yekem 14 û 16'ê Tîrmehê: Hêzên ji Wezaretên Parastin û Karên Hundir ên hikumeta demkî ji bo bidawîkirina pevçûnan destwerdan kirin. Lê belê destwerdana wan bi binpêkirinên berfireh û înfazan yên ku sivîlên Durzî hedef digirtin re, pêk hat.

Pêla duyem: Di 16'ê Tîrmehê de agirbestek hat îmzekirin û hêzên hikumetê vekişiyan. Lê dîsa rewş ne aram bû êriş dîsa pêk hatin. Destwerdana Îsraîlê ya bi rengekî veşartî: Îsraîlê bi hinceta parastina Durziyan êrîşên hewayî û dagirkirinê pêk anîn, piştî vê êrişê rewşa siyasî û leşkerî ya li başûr hîn aloztir bû.

Agirbest û peyman di dawiya sala 2025'an di encama hewldanan hate kirin. Lê belê, parêzgeh rastî felcbûna aborî, wêraniyeke berfireh û rewşeke şînê ya giştî hat ku pîrozbahiyên cejnan betal kir.

### Salek li ser êrişên xwînmij ên Siwêdayê: Komkujî, bêewlehî û metirsiya ku hîn jî didome

Salek di ser êrişên xwînmij ên li ser Siwêdayê ya Sûriyê re derbas dibe. Bi boneya salvgera van êrişan, îro em wê rojê bi bîr tînin ku di wê demê de gelê Durzî rastî yek ji xeternaktirîn êrişên salên dawî hat. Lê her çend salek derbas bûye, hê jî komkujî, êriş û bêewlehî li herêmê bi dawî nebûne. Berevajî wê, nîşaneyên heyî destnîşan dikin ku Siwêdayê hîn jî di nav plan û hesabên siyasî û leşkerî yên mezin de ye û her dem di hedefa êrişên nû de dimîne.

### Bi hovitiyeke mezin li Siwêdayê kiryar hatin kirin

Li ser gelê Durzî êrişên giran hatin kirin ku di nav wan de înfazkirina sivîlan, bi zorê koçberkirina niştecihan, desteserkirina milk û malbatan, talankirina mal û milk û texrîbkirina cihên pîroz pêk hatin. Ev kiryar li gorî prensîbên mafê navneteweyî, dikarin wek sûcên giran û di şertên taybet de wek sûcên li dijî mirovahiyê bêne nirxandin. Herwiha ji êrişên li Beravê dest pê kirî heya bûyerên Siwêdayê û deverên Kurdan, hêj jî lêpirsînên serbixwe û dadperwer li dijî kesên ku berpirsiyar in nehatiye kirin û gelek ji wan nehatiye cezakirin. Nebûna lêpirsîn û hesabdankirinê bûye sedem ku êş û birînên civakên ku rastî van êrişan hatine zêde bibin. Dema ku kesên sûcdar



bê ceza dimînin û jiyana xwe bi awayekî asayî didomînin, hesta bêdadmendiyê di nav qurbaniyan û malbatên wan de hîn zêdetir dibe. Ev rewş di heman demê de peyamekî neyînî ji bo pêşerojê jî dişîne ku sûc bê hesab maye. Ya ku li vir tê xuyakirin ev e ku pergala dadmendiyê li Sûriyê hêj nekariye erkê xwe bi awayekî serbixwe û adil bicih bîne. Dema ku sûcdar nayên lêpirsîn û cezakirin, şert û mercên ku sûcên nû dubare bibin hêsantir dibin. Ji ber vê yekê gelek kes vê rewşê wek nîşanekê dibînin ku di qonaxa nû ya Sûriyê de hîna jî maf, dadmendî û hesabdankirin bi awayekî rastîn nehatiye misogerkirin. Ev asta ku Sûriyê di qonaxa nû re pê re gihiştî.

### Bi hezaran bû qurbanê êrişên li ser Siwêdayê

Bîlançoyên tekezkirî ku hejmara giştî ya kuştin û birîndarkiirina sivîlên bêguneh ên di êrişa ser Siwêdayê de bide diyarkirin tune ye, lê wekî ku di raporên Mafên Mirovan û yên NY de hatiye eşkerekirin ku bi hezaran kuştin û birîndarkirin pêk hatine. Li gorî wê jî ev yek hate eşkerekirin:

**Lêpirsîn û darizandinên navneteweyî yên di Adar û Tîrmeha 2026'an:**

Adara 2026'an: Komîteya Lêpirsînê ya Navneteweyî ya NY rapora xwe weşand ku kuştina zêdetirî hezar û 700 kesan belge dike û nîşan dide ku "sûcên şer ên muhtemel" hatine kirin. Komîteya Lêpirsînê ya Neteweyî ya Sûriyê jî rapora xwe ya dawî pêşkêşî Wezareta Dadê kir. Di heman demê de Komîteya Lêpirsînê ya Navneteweyî ya Serbixwe jî di meha Adara 2026'an de piştrast kir ku hejmara giştî ya kesên ku hatine kuştin ji bo hemû aliyên şer ji hezar 700 zêdetir e ku piraniya qurbanî û binpêkirinan di nav civak û gundên Durzî de kom bûne.

### Rewşa Siwêdayê hîn di nava xeterî û gefan de ye

Salek piştî van êrişan, rewşa Siwêdayê hê jî bi tamî aram nebûye. Li gorî gelek çavkaniyan, planên siyasî û leşkerî yên li ser vê herêmê hîn jî didomin û metirsiyên êrişên nû her roj zêdetir dibin. Ev yek ne tenê ji bo gelê Durzî, lê ji bo hemû pêkhateyên Sûriyê peyamek e ku bêewlehî û nearmiya welêt hîn jî çareser nebûye.

### Heya sucdar neyên darizandin wê metirsiya dubarebûna êriş û komkujiyan berdewam be

Bi vê yekê, bîranîna salvgera êrişên Siwêdayê ne tenê bîranîna trajediyeke xwînmij e, lê di heman demê de bangek e ji bo parastina mafên mirovan, rawestandina tundûtûjiyê û domandina hewildanên ku hemû gelên Sûriyê di nav aştiyekê de bijîn. Heya ku sûcdar neyên darizandin û mafên hemû pêkhateyên civakî neyên parastin, metirsiya dubarebûna van trajediyan dê herdem hebe.



# Yek ji dewlemendtirîn çandên herêmê: Çanda Suryanî

Çanda Suryanî mîrateyeke dewlemend û kevnar e ku ziman, kevneşopî, ol û hunerê dihewîne. Ev çand bi cilên xwe yên gelêrî, muzîka rûhanî û xwarinên xwe yên dewlemend tê naskirin, ew tevî dijwariyên dîrokî û koçberiyê jî, nasnameya xwe ya resen di nav çandên cuda de diparêze.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

Çanda Suryanî yek ji kevintirîn çandên Rojhilata Navîn e, ku berdewamiya şaristaniyên kevnar ên ku li Mezopotamyayê geş bûne temsîl dike. Gelê Suryanî di dîroka çandî, olî û zanistî ya herêmê de roleke girîng lîstiye, ziman, mîrat û adetên xwe bi sedsalan parastine. Çanda Suryanî bi hêmanên xwe yên cihêreng, di nav de ziman, wêje, muzîk, cilên gelêrî, xwarin û adetên civakî û olî, tê xuyan kirin, ku ew dike beşek girîng a mîrateya çandî ya Rojhilat.

Di haman demê de Çanda Suryanî tevlîheviyeke çandî, zimanî û olî ye ku bi kûrahî li Mezopotamya û Sûriyeyê kok digire. Ew bi gelê Suryanî (Aşûrî/Keldanî) ve girêdayî ye û wekî pireke çandî roleke girîng lîstiye, zanist û felsefeya Yewnanî veguhezîne cîhanê.

### Rêgez û kevneşopiyên Suryanî

Cilên Suryanî dîroka civaka Suryanî û girêdana wê bi ax û mîrate re nîşan didin. Cilên kevneşopî li herêmên ku Suryanî lê dijiyan, çi li Iraq, Sûriye, Tirkiye, an Lubnanê, diguherin, lê gelek taybetmendiyên hevpar parve dikirin. Jinên Suryanî cilên dirêj, bi destan hatine çêkirin, bi rengên geş, nemaze sor, şîn û kesk, bi zêrên zêr û zîv xemilandî li xwe dikirin ku bedewiyek taybetî li cil û bergan zêde dikirin. Her wiha di bûyerên taybet û cejnan de serê wan bi morîk û pereyan xemilandî li xwe dikirin. Mêran cilên kevneşopî yên ku ji kirasên fireh, pantolonên dirêj û kemberên qumaş pêk dihatin li xwe dikirin. Li hin herêman, mêran serpel an kefiyek kevneşopî li xwe dikirin, ku nasnameya wan a herêmî nîşan dida. Her çend ev cil û berg êdî rojane nayên lixwekirin jî, ew di dawetan, pîrozbahiyên neteweyî û festîvalên mîratî de hene ku armanc dikin çanda Suryanî vejînin û biparêzin.

Suryanî komek rêgez û kevneşopiyan diparêzin ku ruhê hevgirtina civakî û malbatî nîşan didin. Malbat bingeha civaka Suryanî ye, ku nirxên rêzgirtin, hevkariyê û hevgirtinê di nav endamên wê de serdest in. Dawetên Suryanî bi atmosfera xwe ya cejnê ya bêhempa, ku stran û dîlanên gelêrî û lixwekirina cilên kevneşopî



vedihewîne, têne xuyan kirin. Cûrbecûr pîrozbahiyên olî û civakî jî têne lidarxistin, endamên civakê tînin cem hev û girêdanên wan xurt dikin. Gelê Suryanî dixwaze ziman û mîrata xwe ya çandî, hem li welatê bav û kalên xwe û hem jî li derve, fêrî zarokên xwe bike da ku nasnameya xwe di nav nifşan de biparêze.

### Muzîk û Stranên Suryanî

Muzîka Suryanî yek ji tiştên herî girîng ên nasnameya çandî ya Suryanî ye, ku xwedan dîrokek dirêj e ku bi sedsalan dirêj e. Her çend muzîka Suryanî bi Dêr û wêjeya olî ve girêdayî bû jî, ew pêş ket da ku stranên gelêrî, neteweyî û civakî jî bigire nav xwe. Stranên Suryanî bi muzîka xwe yên aram û kûr têne xuyan kirin, ku hestên şahî, xemgînî û hesretê diyar dikin. Ew mijarên cihêreng ên wekî evîn, welat, bawerî, malbat û koçberiyê vedibêjin. Muzîk di pîrozbahiyên olî, dawetan û bûyerên cûda yên civakî de jî tê bikar anîn. Di nav formên herî berbiçav ên muzîka Suryanî de teranîmê dêrê ne ku bi Suryanî têne kirin, zimanek girîng ji bo Suryanî ji ber ku ew zimanek olî û çandî ya kevnar e. Ev teranîm bi muzîkên xwe yên xweşik û ruhanîbûna kûr têne cuda kirin û wan beşdarî parastina zimanê Suryanî di nav nifşan de kirine. Çend hunermend û stranbêjên Suryanî weke Can Karat, Samir Kabro û Aşûr Bêt Serkîs ku bi berhemên xwe yên muzîkê yên ku beşdarî belavkirin û parastina çanda Suryanî hem li welatê xwe û hem jî li welatên derve bûne, navdar bûne.

### Di Civaka Suryanî de ol

Xiristiyanî hêmanek bingehîn a nasnameya Suryanî ye. Suryanî aîdî çend dêrên Xiristiyan ên Rojhilat in, bi taybetî Dêra Ortodoks a Suryanî, Dêra Katolîk a Suryanî û Dêra Asûrî ya Rojhilat û yên din. Zimanê Suryanî di rêûresmên olî de pîroz tê hesibandin. Dêr di jiyana civaka Suryanî de cihekî girîng digire, rola wê ji qada tenê olî wêdetir diçe û parastina ziman, mîrat û çandê jî di nav xwe de digire. Suryanî ji bilî hejmarek bûyerên olî yên taybetî yên ku bi rêûresm û kevneşopiyên xwe yên mîras têne diyar kirin, cejnên cûrbecûr ên Xiristiyanî, wek Noel û Paskalya, pîroz dikin.

### Zimanê Suryanî

Zimanê Suryanî wekî yek ji stûnên herî girîng ên nasnameya çandî ya Suryanî tê hesibandin. Ew yek ji zimanên Semîtîk ên kevnar e, ku kokên wê di Aramî de ne. Vî zimanî di demên kevnar û navîn de rolek girîng di veguhestina zanist û zanînê de lîst. Suryanî hîn jî li hin dibistan û saziyên çandî tê hînkirin û di dêr û merasîmên olî de tê bikar anîn. Gelek rewşenbîr û lêkolîner ji bo parastina wê û veguhestina wê ji nifşên nû re wekî beşek girîng a mîrata Suryanî dixebitin.

### Suryanî bi xwarinên xwe yên cûrbeûr tê nas kirin

Xwarinên Suryanî bi cûrbecûrî û dewlemendiya xwe ya di tamên kevneşopî de ku ji nifşan ve têne veguhastin, têne nas kirin. Ew xwe dispêre madeyên xwezayî yên wekî genim, bulxur, goşt, sebze û giyayên herêmî. Di nav xwarinên Suryanî yên herî navdar de kibbeh bi awayên xwe yên cûrbecûr, dolma, tebûle, yabraq pelên tirî yên tijîkirî û bulxurê ku bi goşt û sebzeyan tê pijandin hene. Malbatên Suryanî bi amadekirina cûrbecûr nan û şîraniyên kevneşopî jî têne nasîn, ku di bûyerên taybetî û betlaneyan de têne pêşkêş kirin. Mêvan di civaka Suryanî de cihekî taybetî digire, ku pêşwazîkirina mêvanan û pêşkêşkirina xwarinê ji wan re yek ji nirxên civakî yên mîratî yên herî girîng tê hesibandin.

### Pêşketinên Çandî yên Suryanî

Gelê Suryanî di vejîna zanistî û çandî ya Rojhilat de roleke girîng lîst. Zanayên Suryanî beşdarî wergerandina pirtûkên felsefî, bijîşkî û zanistî ji Yewnanî bo Suryanî û dûv re bo Erebî bûn û danûstandina zanînê di navbera şaristaniyên cûda de hêsan kirin. Wan her wiha dibistan û navendên zanistî û olî ava kirin ku bandorek girîng li ser pêşketina raman û çandê li herêmê kirin, beşdarî warên bijîşkî, felsefe, ziman û wêjeyê bûn. Çanda Suryanî mînakek zindî ya cihêrengiya şaristanî û çandî ya Rojhilata Navîn temsîl dike. Ew çandeke kevnar e ku dîrok, ol, ziman, huner û adetên civakî bi hev re dike yek û tevî dijwariyên ku di seranserê sedsalan de pê re rû bi rû maye, di parastina nasnameya xwe de serketî bûye. Gelê Suryanî îro jî hewlên xwe didomînin da ku vê mîrateya dewlemend biparêzin û bidin nifşên pêşerojê, da ku ew wekî beşek girîng a mîrateya mirovî û çandî ya cîhanî bimîne.



**Remezan Olçen**

## Bi hunerê parastina hiş

Dema ku tiliyên me li ser camên sar ên telefonan diçin û tên, em ne tenê wextê xwe, şiyana xwe ya dîtin û fêmkirina hev jî ji dest didin. Çare çi ye? Pirs eve û gelek bersiv hene lê bersiva min ji nû ve sazkiirna têkiliyên civakê, têkiliya bi edebiyat û hunerê re ye.

Îro li ku derê cîhanê bibe bila bibe, mirov di nav qelebalixiyeke bêdeng de dijîn. Li derve bibe, li ser rê bibe an jî di nava malê de bibe; serê her kesî xwar e û çav li ser ekranên şîn ên telefonan e. Ev dîmena ku em jê re dibêjin "serdema dîjîtal", di eslê xwe de êrişeke pir mezin e li ser xezîneya me ya herî pîroz: li ser baldariya me. Platformên dîjîtal, torên înternetê û pergalên modern, weke nêçîrvanên sedsala nû, li pey her saniyeya hişê me ne. Ew her klîkekê û her rûpelekê vediguherînin drav û sermayeyê. Lê belê, di vê bazirganiya mezin de, tiştê ku herî zêde tê parçekirin û herifandin, rûh û cewhera mirovbûnê ye.

Em her ku diçin ji rastiya jiyanê dûr dikevin. Berê, gava mirov li çîrokekê guhdarî dikir an jî pirtûkek dixwend, xwe dixiste nav wê cîhanê; pê re dinaliya û pê re şa dibû. Jê re dem, sebir û kûrbûn lazim bû. Lê îro algorîtma rê nadin ku em li ser tiştekî kûr bibin. Serkeftina vîdyoyekê bi 15 saniyeyan tê pênasekirin. Gava lez dibe qanûna jiyanê, fikrîna li ser û pirsîn dihele, namîne. Mirovê ku nikaribe bala xwe bide ser êş an jî kêfxweşiya kesekî/ê, di hîsa xwe de jî ko dibe. Trajediyek li aliyê din ê cîhanê, li ser ekrana me, tenê bi livandina tiliyekê ji bîr dibe û cihê xwe dide reklameke bazirganiyê. Ev rewş wijdanê mirovî bêhest dike.

Ev qeyran ji bo me, ango ji bo xwendevan û rewşenbîrên Kurmancî, xwedî rûyekî hîn kûrtir û polîtîktir e. Zimanê me û çanda me, ku bi salan e di bin zextan de xwe bi sînorê sebrê diparêze, îro bi asîmîlasyoneke nerm a dîjîtal re rû bi rû ye. Cîhana dîjîtal, raman û bala ciwanên me ji rastiya wan a civakî û xwecihî qut dike û dikişîne nav deryayeke global a bêbexş. Dema ku temasa fîzîkî kêm dibe, zimanê pirtûkan û zindîbûna peyvan di nava rûpelên dîmenî de wateya xwe ya rastîn ji dest didin. Çimkî parastina nasnameyekê, berî her tiştî hewceyî bi baldariyeke kûr û hişmendiyeke birêxistinkirî ye.

Li hemberî dîktatoriya algorîtmayan a ku mirov dikişîne nav tenêtiyê, dermanê me yê herî xurt temasa mirovî ya zindî ye ku di nava hewşên edebiyat û hunerê de şîn dibe. Edebiyat, hîmê herî xurt ê vê berxwedanê ye. Gava em li dora pirtûkekê tên ba hev, dema em di gotûbêjeke edebî de rûbirû rûdinên an jî di şeveke helbestan de li dengê hev guhdarî dikin, em tenê peyvan parve nakin; em bêhna hev, germahiya çavan û rûhê hev parve dikin. Ev rûbirûbûn, wan dîwarên dîjîtal ên ku pergalê di navbera me de daniye, hildiweşîne.

Çalakiyên hunerî yên kolektîf –çi pêşangehek be, çi şanoyek an jî konser bin– qadên pîroz ên parastina vegera li xwe ne. Mînak, li saloneke şanoyê, dema ku lîstikvan li ser dikê bi zimanê dayikê lîstika xwe dilîzin û em bi sedan kes bi yek bîhnê, bêyî ku çavê me li ser telefonê be, wan temaşe dikin, em tora dîjîtal ji ser hişê xwe davêjin. Li wir enerjiyeke civakî ya rastîn ava dibe. Huner, sebir û kûrbûnê hînî me dike; wekî mertaleke parastinê ye li dijî leza pûç a sedsala nû. Ji bo ku em desthilata tiliyên xwe ji destê ekranan derxin, bersiva herî şoreşgerî "hêdîbûn" e. Vegerîna ser pirtûkên kaxezî ku mirov kela wan hîs dike, guhdarîkirina bêdengiya hev di nava hewşên çandê de û xwedîderketina li baldariyê, sînorê dawî yê parastina mirovbûna me ye. Di vê sedsala dîjîtal de, her gava ku em tiliya xwe ji ser ekranê radikin û bi destê mirovekî/ê din digirin, em asasa paşerojeke nû jî datînin.

# ‘Ji bo diyarkirina buhayê nanê siyahî lêkolînên berfireh têne kirin’

Alîkarê Rêveberê Şaxa Nangehan li Hesekê, Rondar Salih destnîşan kir ku aliyên pêwendîdar ji diyarkirina buhayê nanê siyahî lêkolînên berfireh dikin û got, “Her guhertinek di buhayê nan de wê li ser bingeha lêkolînek berfireh be, berjewendiyên welatiyan û nangehan jî wê li ber çavan bê girtin.”

Lîloz Hisên/Qamişlo

Buhayên madeyên bingehîn ên ku dikevin çêkirina nan, ji ber zêdebûna lêçûnên sotemenî, madeyên wê û guherînên di rêjeyên sirfa dolar de bi berdewamî diguherin, ev yek rasterast bandorê li sektora nangehên Siyahî dike. Di çarçoveya van guhertinan de û da ku di navbera hilberîner û xerîdar de hevsengiyek çêbibe, daxwazên ji bo ji nû ve nirxandina buhayan zêde dibin.

### Bilindbûna lêçûna hilberînê

Di vê çarçoveyê de, alîkarê Rêveberê Şaxê Nangehan li Hesekê Rondar Salih, diyar kir ku nangehên Siyahî nangehên taybet in, ku pêdiviyên hilberînê ji bazarên azad dikrin, ev yek wan ji guherînên buhayê û lêçûnên xebitandinê yên bilind bêtir bandor dike û wiha got: “Yek ji sedemên herî berbiçav ên ku xwediyên nangehan neçar kirin ku daxwazên xwe pêşkêş bikin, zêdebûna buhayê madeya mazotê ya ku ji nangehên Siyahî re tê veqetandin, bû. Berê buhayê lîtreyek mazot ji bo nangehên Siyahî bi 55 sentên Amerîkî dihat firotin, ev yek jî berî ku di demên dawî de bigihîje 75 sentên Amerîkî ji bo her lîtreyê, di heman demê de buhayê lîtreyek mazota ji bazara serbest bi 88 sentên Amerîkî ye. Ev zêdebûn rasterast bandor li ser lêçûnên xebitandin û hilberînê kiriye, nemaze ji ber ku mazot yek ji hêmanên bingehîn ên herî girîng di pêvajoya çêkirina nan



û xebata rojane ya firinan de ye.”

### Daxwazên xwediyên nangehan

Rondar Salih îşaret kir ku xwediyên nangehên Siyahî giliyên fermî pêşkêşî rayedarên pêwendîdar kirine, ku tê de hejmarek ji zehmetiyên ku li hember wan derdieke di encama bilindbûna buhayên pêwistiyên hilberîna nan diyar kirin û wiha berdewam kir: “Di destpêka van pirsgirêkan bilindbûna buhayên sotemeniyê ye wekî din gumrika ku li ser madeya ard tê ferzkirin. Xwediyên nangehan piştrast kirin ku lêçûna hawirdekirin û veguhestina ard di dema borî de zêde bûye, ev di buhayê her tonek ardê ku di çêkirina nanê Siyahî de tê bikar anîn de diyar bû, ev yek hiştiye ku barên darayî li ser wan zêde bibe.”
Rondar Salih destnîşan kir ku guherînên ku di rêjeya danûstandina dolarê Amerîkî li hember lîreya Sûrî de çêdibe, bûne sedema bilindbûna buhayê gelek madeyên ku tevlî pêvajoya hilberînê dibin, çi madeyên xav bin çi jî pêdiviyên xebitandinê, ku ev yek zextên aborî li ser nangehan zêde kiriye.

### Bandora rasterast li ser buhayan

Rondar Salih diyar kir ku xwediyên nangehan dibînin ku ev zêdebûna li pey hev a lêçûnên hilberînê, pêwîstiyê bi nirxandina buhayê desteyek nanê Siyahî dike û zelal kir ku niha buhayê vê desteyê bi 5 hezar û 500 lîreyên Sûrî digihîje welatiyan û wiha lê zêde kir: “Xwediyên nangehan dibînin ku berdewamkirina xebata bi buhayê heyî di çarçoveya bilindbûna lêçûnan, dê bandoreke neyînî li ser şiyana wan ya domandina hilberînê bike. Bi taybety bi zêdebûna buhayên sotemeniyê, madeyên xav û pêwistiyên dagirtinê. Daxwazên ku ji hêla xwediyên nangehan hatiye pêşkêş kirin, bi awaeyekî sereke li ser guhertina di desteya nan de li gorî rastiya heyî ya lêçûnan disekine.”

### Wergirtin û nirxandina gilînameyan

Rondar Salih destnîşan kir ku rayedarên pêwendîdar hemû gilî û daxwazên ku ji hêla xwediyên nangehên Siyahî ve hatine pêşkêş kirin wergirtine û li gorî tedbîrên pejirandî wan çareser kirine, herwiha ji xwediyên nangehan re hatiye xwestin ku heta ku lêkolînek berfireh were temam kirin û biryara guncav were dayîn, firotina nan bi buhayê heyî yê pejirandî bidomînin û wiha got: “Rayedarên peywendîdar dixwazin berî ku her buhayek nû diyar bikin, dosyayê bi baldarî lêkolîn bikin, da ku piştrast bibin ku li ser bingeha hejmar û daneyên rastîn ên ku lêçûnên rastîn ên hilberînê nîşan didin, encamê adil misoger bikin.”

### Avakirina komîteyek taybet

Rondar Salih diyar kir ku ji bo lêkolînkirina rastiya çêkirina nanê Siyahî û bandorê ku li ser tê kirin ji hêla hilbeîna madeyê, komîteyeke taybet hatiye ava kirin û wiha da zanîn: “Komîteyê bi armanca gihşatina buhayeke edlane û guncav dest bi kar û xebatên xwe yê meydanî kiriye. Di heman demê de tenê xwe naspêre temînên giştî, lê gerên meydanî yên rasterast bo aliyên girêdayî proseya hilberînê, pêk tîne. Herwiha komîteyê serdana navendên frotina ard kiriye û buhayê wê tesbît kiriye, wekî din bi berpirsyarên ku li ser sektora sotemeniyê hevdîtin kiriye da ku buhayan û makenîzmeya belavkirina wê li ser nangehan nas bike. Komîteyê bi awayekî rasterast serdana hejmareke ji nangehên Siyahî kiriye, ji bo ku xerckirina rastîn ya madeyên ku di hilberîna nan tê bikar anîn, nas bikin. Herwiha mîqdara sotemeniyê û madeyên din ku di çêkirina nan de tê bikaranîn lêveger bike. Bi armanca belgekirina buhayên rastîn yên ku li bazarê tên frotin, di nava gerên meydanî de, buhayê xemîre, xwê û kîsên nan û madeyên din ji bo dagirtinê hatin lêkolîn kirin, wekî din danûstandin bi kargeh û kompaniyên ku van madeyan didin nangehan hat kirin.

### Lêkolîn ji bo pêkanîna hevsengiyeke guncav e

Rondar Salih tekez kir ku armanca serke ji vê lêkolînê ne tenê diyarkirina buhayê ji bo desteya nan e, lê belê gihaştina formulekê ku hevsengiyê di navbera berjewendiyên welatiyan ji aliyekî û berjewendiya xwediyên nangehan ji hêleke din ve pêk bîne, ye. Aliyên peywendîdar hewil didin ku barê welatiyan giran neke di encama bilindbûna buhayan, di heman demê de jê xwediyên nangehan bi xisarên mezin rû bi rû nemînin û bandorê li ser berdewamiya kar û helberînê wan neke. Komîteya taybet wê encama dawî de li ser daneyên ku ji bazaran, aliyên têkildar û nangehan berhevkirine, derxîne, piştre dê pêşniyarên pêwîst werin dayîn û biryara guncav derbarê buhayê nû de were girtin.”
Alîkarê Rêveberê Şaxa Nangehan li Hesekê Rondar Salih wiha gotina xwe qedand: “Lêkolîn hîn berdewam e, komîteya taybet berî ku rapora xwe ya dawî amade bike, xebatên temamkirina hemû tedbîrên pêwîst dike. Her guhertinek li ser desteya nanê Siyahî di pêşerojê de bê der xistin, wê li ser van encaman be, ev yek jî piştî lihevhatina bi rastiya aborî û daxwazên qnaxa heyî dê pêk bê, da ku aramiya bazarê were garantîkirin û peydakirina nan bênavber ji bo welatiyan were parastin.”

# FAO: Buhayên xwarinê yên cîhanî kêm bûye

Navenda Nûçeyan

**Li gorî daneyên Rêxistina Xurek û Çandiniyê ya Neteweyên Yekbûyî, di meha Hizêranê de buhayên xwarinê yên cîhanî hinekî kêm bûn û buhayên genim, şekir û berhemên şîr zûtir ji zêdebûna buhayên rûnên nebatî û goşt, kêm bûn.**

Rêxistinê di rapora xwe ya mehane de got ku pîvana navînî ya buhayê xwarinê di meha Hizêranê de gihîştiye 130.3 xalan, li gorî 130.8 xalên meha Gulanê, ku ji heman serdema sala borî ji sedî 1.7 bilindtir e.

### Pîvan ji lûtkeya xwe ya 2022’an dûr dikeve

Her çend pîvan li jor asta xwe ya salek berê mabe jî, lê ew hîn jî ji sedî 18.7 li jêr asta xwe ya dîrokî ya Adara sala 2022’an e, piştî destpêkirina şerê Rûsya-Ukraynayê û têkçûnên paşê di bazarên xwarinê yên cîhanî de.
Piştî ku di meha Nîsanê de gihîşt asta herî bilind a sê salan, dema ku aloziyên jeopolîtîk bûn sedema bilindbûna buhayên rûnê nebatî, pîvan di meha Gulanê de jî kêm bûbû.
Pîvana buhayê genim li gorî meha Gulanê ji sedî 3.5 kêm bû, ji ber lezandina çinînê û hêviyên dabînkirina zêde buhayê genim di bin zextê de bûn, di heman demê de buhayên garis kêm bûn, ji ber ku ev yek bi hêviya hilberîna xurt û buhayên kêmtir ên petrolê ve girêdayî bû.
Piştî ku buhayên kêm ên etanolê li Brezîlyayê hilberîneran teşwîq kirin ku bêtir qamîşê şekir ji bo hilberîna şekir bikar bînin, bihayên şekir jî ji sedî 5.7 daketin, her çend fikarên hilberînê li hin welatan leza kêmbûnê sînordar kir.

### Bihayên goşt û rûnê berdewam bilind dibin

Li hemberî vê yekî pîvanî buhayê goşt bi rêjeya ji sedî 0,4 zêde bû û gihîşt asta herî bilind a nû, ji ber zêdebûna daxwaza gerdûnî ya ji bo goştê mirîşkan.
Herwiha rûnê nebatî jî ji sedî 3,8 zêde bû, ku bi buhayên bilind ên rûnê Nexîl û rûnê Leftê ve hate piştgirîkirin, bi berdewambûna daxwaza li ser madeyên xav ên ku di hilberîna biyodîzelê de têne bikar anîn.
Di heman demê de, ji ber daxwaza xurt a Asyayê pîvanê buhayê bircnê ji sedî 3.2 zêde bû, lê ji ber




başbûna dabînkirinê buhayên şîr ji sedî 1.5 kêm bûn.

### Berhema genim nêzîkî astên rêjeyî ye

Di raporek cuda de, rêxistinê texmînên xwe yên ji bo hilberîna genim a cîhanî di sala 2026’an de li 2,983 milyar ton hişt, ku ev hejmar ji pêşbîniya xwe ya berê neguheriye. Tevî ku ev ast ji rêjeya sala 2025’an bi qasî ji sedî 1,9 kêmtir be jî, ew duyemîn hilberîna genim a herî bilind a cîhanî dimîne, ku nîşana berdewamiya pirbûna dabînkirinê li bazarên cîhanî ye.



# Nûnertiya parlementoyê ji destê gel hatiye derxistin

Teyînkirina endamên Parlementoya Sûriyê ne bi îradeya gelên Sûriyê ku rasterast bi dengdanê were kirin, lê ji aliyê dezgehên hilbijartinê yên herêmî û serokkomar ve hatin hilbijartin, lewma gelên Sûriyê endamên parlementoyê wekî nûnerên xwe nabînin û daxwaza wan avakirina destûrekî demokraîtk û yekbûna gelên Sûriyê ye.

Ronaz Silêman/Qamişlo

Piştî hilweşîna rêjîma berê di Kanûna 2024’an de, Sûriyê şahidiya rêzeguhertinên siyasî yên kûr kir, ya herî girîng ji nû ve avakirina saziyên destûrî yên dewletê, di nav wan de Meclisa Gel a Sûriyê wekî desthilata yasadanînê ya welêt.

### Destpêka dema veguhêz

Piştî hilweşîna rêjîma berê û avakirina hikumeta demkî bi serokatiya Serokkomar Ehmed El-Şaraa ve, Meclisa Gel a ku di bin rêjîma berê de hebû hate hilweşandin, ji ber ku ew wekî beşek ji avahiya siyasî ya bi serdema borî ve girêdayî dihat hesibandin. Bi nebûna desteyek yasadanînê ya hilbijartî, hewcedariya avakirina meclisek nû derket holê ku li gorî şert û mercên niha ên ku welat pê re rû bi rû dima.
Di Adara 2025’an de Danezana Destûrî ya Demkî hate weşandin ku taybetmendiyên serdema veguhêz destnîşan kir. Ew avakirina Mecliseke Gel a nû ku ji 210 endaman pêk tê destnîşan kir ku du ji sêyan ji wan dê bi rêya dezgehên hilbijartinê yên herêmî werin hilbijartin, sêyeka mayî dê ji hêla serokKomar ve were tayînkirin.

### Mekanîzma hilbijartina endaman

Li gorî Danezana Destûrî ya ji bo serdema Veguhêz tu hilbijartinên giştî yên rasterast nehatine lidarxistin ku hemû welatî çibebûn herin ser sindoqan, da ku endamên Meclisa Gel hilbijartibana, lê ew bi awayekî ne raste rast pêk hat. Di bin hinceta ji ber şert û mercên ewlehî û mirovî yên ji ber salên şer û koçberiyê, rayedarên hikumeta demkî pergala hilbijartinên rasterast ên gel qebûl nekirin. Di şûna wê de, wan serî li pergala dezgehên hilbijartinê yên herêmî dan. Komîte û dezgehên hilbijartinê li parêzgehan hatin avakirin da ku nûnerên xwe ji bo Encûmenê hilbijêrin.
Di navbera salên 2025 û 2026’an de, pêvajoya hilbijartinê di çend qonaxan de pêk hat, di encamê de bi qasî du ji sêyan endamên encûmenê ji parêzgehên cûda yên Sûriyê hatin hilbijartin. Hejmara kursiyên ku ji her parêzgehekê re hatine veqetandin li gorî mezinahiya nifûsa wê û şert û mercên heyî yên li ser erdê diguherin.

**Mekanîzma wiha bû:**

Komîte û dezgehên hilbijartinê li parêzgehên Sûriyê hatin avakirin. Van dezgehan nûnerên xwe bi awayekî nerasterast hilbijartin.



Nêzîkî du ji sêyan endamên Meclisa Gel (nêzîkî 140 endam) bi rêya van dezgehên herêmî hatin hilbijartin.
Serokkomarê Sûriyê Ehmed El-Şeraa sêyeka mayî (70 endam) tayîn kir. Piştre Meclis bi tevahî 210 endaman temam bû.

**Li gorî dabeşkirina kursiyan a ragihandî, divê parêzgeh wiha werin temsîlkirin:**

Hejmara Kursiyên Parêzgehan jî wiha bû:

Heleb 32
Şam 10
Gundewarê Şamê 12
Humis 12
Hema 12
Idlib 12
Dêrazorê 10
Hesekê 10
Laziqiyê 7
Deraa 6
Reqa 6
Tertûs 5
Siwêda 3
Quneytera 3

Bi tevahî 140 kursiyên hilbijartî, ji bilî 70 kursiyên ku ji hêla serok ve hatine tayînkirin ku bi tevahî digihîje 210 endaman.
Lê belê di pratîkê de hilbijartin li hemû parêzgehan neqediyan. Hilbijartinên li Parêzgeha Siwêdayê ji ber rewşa ewlehî û siyasî hatin paşxistin û ji ber vê yekê sê kursiyên wê dema ku encamên destpêkê hatin ragihandin vala man. Herwiha deverên li bakur-rojhilatê Sûriyê beriya ku temsîliyet bi dawî bibe rastî derengmayîn û zehmetiyan hatin. Hejmara kesên ku beşdarî dengdanê bûn ne ji nifûsa giştî bûn, lê dezgehên hilbijartinê yên herêmî (komên dengdêrên bijartî) bûn. Van kesan bi awayekî nerasterast du ji sêyan endamên encumenê hilbijartin. Ji ber vê yekê, xala sereke ya nakokiyê ne tenê hejmara kursiyan e, lê ew rastî ye ku hilbijartin nerasterast bûn û bi dezgehên hilbijartinê yên taybetî ve sînordar bûn, ne ku dengdanek giştî ku hemû welatiyan tê de beşdar bûn.

### Temamkirina damezrandinê bi tayînkirinên serokkomar ve

70 kursiyên vala mabûn û li benda tayînkirinên serokkomar yên ku di Daxuyaniya Destûrî de hatine destnîşankirin, mabû. Di 1’ê Tîrmeha 2026’an de ew 70 endam hatin tayînkirin. Bi ragihandina lîsteya navên endamên parlamentoyê, hejmara endamên parlamentoyê temam bû, ji bilî nûnerên Parêzgeha Siwêdayê ku endamên wan hîn nehatine hilbijartin.
Navên 70 endamên ku ji hêla serokê hikumeta demkî ya Sûriyê Ehmed El Şeraa ve ji bo endametiya parlamentoya Sûriyeyê hatine destnîşankirin, wiha bûn: “Ferhan El Sebaî, Enes Mihemed El Ebda, Eymen Mihemed El Şuqeyrî, Ehmed Omer Zêdan, Ehmed Qedûr El Efdal, Ehmed Newaf El Cerba, Îsraa Zuhêr El Meşhûr, Bedir Muhyedîn Muhemed El Cemûsûrî, Husame El Dîn Mihemed Zekeriya Terterî, Husamedîn Mihemed Mecîd Rezma, Hesen Îbrahîm Dixêm, Hesen Mihemed Selîm Sûfan, Husên Ebdulrehman El Elî, Huseyîn Mihemed Esaf, Hemze Casim Qeblan, Hemûd Îbrahîm El Hamûd, Henan Îbrahîm El Belxî, Xeldûn Cemal El Ehmed El Ehmed, Xaldûn Cemal El Ehmed, Xelîl Derde El Ebdela, Dawa Ebdilhemîd El Ehmed, Ramî Şaher El Saleh, Rozîna Amer El Ledqanî, Siûd Feysel El Necras, Sumeya Murad Murad, Semîra Eymen El Watar, Suhêl Hebîb El Fadel, Subh Eqla El Bedah, Eyşe Mihemed Fehd El Dibs, Ebdul Hekîm Hewas Beşar, Ebdulhemîd Ekil El Awak, Ebdulrehman Mecham Mistefa, Ebdulkerîm Ehmed Berekat, Ebdullah Zuhêr El Zayid, Ebdul Munîm Mihemed El Nesîf, Ala Huseyn El Mûsa, Emad Yaqûb Berq, Omer Fewaz El Mihemed, Îsa Mihemed Îbrahîm, Fatima Ebdulletîf El Yûsif, Fatima Mihemed Heyder, Cebraîl Mûşî Kûriye, Lara Fethî Qadîd, Leys Wehîd El Balûs, Mueyad Hayîl Medîher, Mueyad Hayîl El Qeblawî Madona Suhêl Bişara. Mahir Ebdilwehab Elûş, Mihemed Îbrahîm El Zûbî, Mihemed Îbrahîm Hac Osman, Mihemed Ziyad El Rebat, Mihemed Seîd Ebdulqader El Heso, Mihemed Elî Mihemed Yasîn, Mihemed Nayîf Baelas, Mihemed Yasir Delwan, Mihemed Yasir Ebdulkerîm El Hamidî El Hemad, Mihemed Mûsa El Terîha, Merwa Mihemed Sobhî Toto, Mistefa Ebdulrehman Ebdî, Mistefa Yihya Akoş, Museb Xelîl Şêx Jad’an El Hafil, Muder Wefîq Hemdan, Munzir Ehmed Seras, Muharib Mihemed El Hemûd, Nasir Mihemed El Hemûd, Nasir Muhammed El Xerîs Herîrî, Necwa Behcet Qesas, Nûra Îlyas Necme, Huda Ebdulbasît Atasî, Heysem Yûsif El Maasas, Wadî Mihemed Hac Hemûd, Yasir Silêman Mensûr û Yihya Mihemed Îmad Îbrahîm.”

### Paşguhkirin û sînordarkirina jin di nava tayîkirinên Parlementoya Sûriyê de

Tiştê herî balkêş ji bilî paşguhkirina tevahî gelên Sûriyê ya mafên dengdanê, paşgukirina “Jina Sûrî” ye ji ber ku piştî ragihandina temamkirina ferîmî ya lîsetaya parlemetoyê hate dîtin ku li gorî lîsteya dawî ya endaman, hjmara jinan di parlamentoyê de ji 210 endaman tenê 22 jin in, ango rêjeya jinan tenê ji Sedî 10.48 e. Ji wan, 7 ji hêla dezgehên hilbijartinê ve hatin hilbijartin, 15 jî hêla El Şaraa ve hatin destnîşankirin. Ev yek di vir de û derveyî vir de sîstema zihniyeta zayendperest a ku jin qebûl nake, dide eşkerekirin. Jina Sûrî berdêla herî giranbuha a Şoreşa Sûriyê daye, lê şeremeke herî mezin e ku li hemberî keda xwe rastî vê yekê tê. Lewra têkoşîna jinên Sûriyê dewam dike û sînordarkirina rêjeya jin bi van hejmaran nayê pijrandin, guhertina Sûriyê ji vê pirsgirêka bingehîn a zihniyetê dest pê dike.

### Xala giştî ya van teyînkirina jî ew e ku parlamento bê îradeya gel hatiye avakirin

Di raya giştî de gotin endamên parlamentoyê hatine hilbijartin. Lê ya rast divê were gotin ku hilbijartin çênebû, lê endam jî ji aliyê hikumeta demkî ve hatine teyînkirin. Endamên parlamentoyê ji sêyan yek ji aliyê serokkomarê hikumeta niha ve hatin hilbijartin û yên dîtir ji aliyê desteyên ku serok tayîn kirine, hatin diyarkirin. Li ser vê bingehê her çiqasî ev kesên ku hatine teyînkirin bi rûyekê ji rûyên pişt perdeyê veşartî xwe bidin diyarkirin ku ew ê xebatê ji bo avakirina Sûriyê û gelê wê bidin meşandin, lê di teyînkirina wan de diyar e ku xebatên wan çawa wê werin birêvebirin, ger xema gel a esas ba, wê demê divyabû gel nûnerên xwe ji xwe re diyar bikin û dengê xwe bidin wan, ne ku deriyê dengdanê li pêşiya wan girtî ba.

### Di vir de em hevrûkirinê li ser dema rêjîma Baasê û hikumeta niha bikin çi cudahiyên xwe hene

Dema ku dîroka parlementoyê di bin rêjîma Baasê de û prosedurên heyî yên ji bo avakirina parlementoyek nû tê lêkolînkirin, cudahiya di navbera parlementoya niha ya di qonaxa veguhêz de û Meclisa Gel a berê ya di bin rêjîma Baasê de dikare ji du perspektîfên sereke were zelalkirin: mekanîzmaya avakirina wê û cewhera rola wê ya siyasî.
Di bin rêjîma berê de, bi serokatiya Partiya Baasê Meclisa Gel bi rêya hilbijartinên giştî yên rasterast dihat hilbijartin. Lê belê pêşbaziya siyasî bi pratîkî bi çarçoveya Partiya Baas a Sosyalîst a Ereb û hevalbendên wê di Eniya Pêşverû ya Neteweyî de sînordar bû. Vê yekê bi piranî encamên hilbijartinê pêşwext diyar kir, di heman demê de şaxa yasadanînê li gorî şaxa rêveberiyê rêjeyek sînorkirî ya serxwebûnê parast.
Lê di parlementoya niha de, ew xwe naspêre hilbijartinên rasterast ên gel. Di şûna wê de ew bi rêya dezgehên hilbijartinê yên herêmî yên ku ji hêla rayedarên parêzgehan ve têne hilbijartin, ji bilî destnîşankirina hin endaman bi biryara hikumeta demkî ya Sûriyê, tê avakirin. Ev cûdahiyek di mekanîzmaya gihîştina parlementoyê de temsîl dike, lê di heman demê de ew di derbarê asta nûnertiya rasterast a gel û pileya beşdariya gel di hilbijartina wê de jî mijara nîqaşê dimîne.

### Siberoja Sûriyê bi destûrekî demokratîk ve girêdayî ye

Di dawiyê de ev yek divê were gotin, “Sazkirina Sûriya nû, bingeha xwe ji dengê gel digre, bi taybet cihên ku herî zêde eleqedarî gel dike, divê temsîla gel tê de hebe. Bi rengê niha û zihniyeta heyî wê avabûna Sûriyê dereng bikeve, bi taybet qonaxa niha a ku giştî herêm tê re derbas dibe, wê bandoriyeke xwe ya mezin li ser siberoja Sûriyê hebe, Sûriyê jî ji wêraniyeke din re ne amade ye, hîna xwe bi ser hev de ne aniye. Lewam divê berjewendî û tevahî saziyên hikumeta demkî ya Sûriyê bikevin xizmeta gel de û siyasetên derve bandora xwe li ser Sûriyê nemînin. Ya girîng yekbûna gelên Sûriyê di destûrekî demokratîk de were avakirin. Ev jî hewcedarî guhertinên mezin e ku divê demildest pêk bên.”

# Di dîrokê de berxwedaniya hin kesayetên navdar li hemberî desthilatdariyê

Ji destpêka ku desthilatdarî hatiye avakirin, destê xwe daniye ser hemû hêlên jiyana mirovan, di nav de jî rewşenbîr û fîlozof. Ji Suqrat bigire heya Galîleo, Imêl Zola, Aleksander Solcenitsyn, Ferec Foda û Rêber Apo, van kesayetên dîrokî serî li hemberî desthilatê netewandiye û bûne xizmetkarên azadiya civakê.

Hemza Sêvo/ Qamişlo



Di hemû civakên mirovahiyê de çand û siyaset du hêzên bingehîn in ku bandoreke mezin li ser jiyana civakî û siberoja neteweyan dikin. Rewşenbîrî wekî ku antropololojî diyar dike, komeke ji nirx, raman, bawerî û mîrateya fikrî ya mirov e. Siyaset jî hunera di cewhera xwe de rêvebirina karûbarên gel û parastina berjewendiyên civakê ye, lê dema ku naveroka vê têgehê tê berovajîkirin, kirîz dest pê dike, ango dema siyaset dibe hunera bidestxistina armancên desthilatdarê êdî pirsgirêk derdikevin.

Di navbera van her du qadan de ango rewşenbîrî û siyaset têkiliyeke girîng û aloz heye. Hin caran rewşenbîrî û siyaset hev du piştgirî dikin û dibe sedema pêşketina civakê, ev yek dema ku her du qad di cewhera xwe ya rast de xebatê didin meşandin. Hin caran jî ew dikevin nav pevçûn û nakokiyan, bi taybetî dema ku desthilat dixwaze bîrweriya nivîskar, bîrwer, rexnegir û tevahiya rewşenbîran bixe bin destê xwe. Ji ber vê yekê pirsên girîng derdikevin holê: gelo di civakekê de rewşenbîr girîngtir e yan hêza desthilatdariyê? Çima di dîrokê de gelek caran nakokî di navbera rewşenbîr û desthilatdaran de çêbûye?

**Çima rewşenbîr wekî metirsiyek ji bo desthilatê tê dîtin?**

Di gelek serdem û welatan de rewşenbîr di çavê desthilatdaran de wekî metirsiyek hatiye dîtin. Ji serdema mîrenşînên cîhanî heya roja îro bi rengê cuda gelek caran hewl dane ku rewşenbîran bi pere, çîn, kar an jî imtiyaz bikşînin aliyê xwe. Armanc ew bû ku dengê nivîskar, rexnegir, fîlozof û hemû rewşenbîran were bêdengkirin û rewşenbîr bibe alîkarê desthilatê. Lê dema ku rewşenbîr ev pêşniyar red dikin û li ser prensîbên xwe dimînin, gelek caran rastî zordestiyê tên. Zindan, sergûn, işkence, tawanbarkirina bi xiyanetê û heta kuştin ji hêla desthilatdaran ve hatiye bikaranîn. Di cîhanê de gelek nimûneyên wiha hene, lê navdarên wan Suqrat, Galîleo, Imêl Zola, Aleksander Solcenitsyn, Farec Foda û Rêber Apo ye.

**Suqrat; Fîlozofê ku ji bo civakê mir**

Suqrat ji 470'î heya 399'an B.Z jiyaye, ew wekî yek ji fîlozofên herî girîng ên dîrokê û damezrînerê felsefeya rojavayî tê hesibandin. Ew li Atînayê jiya û ji bo gihîştina rastiyê xwe sipart diyalog û pirsînê. Wî berhemên nivîskî nehiştin, lê ramanên wî bi rêya xwendekarên wî, bi taybetî Iflaton, gihîştine roja îro. Suqrat rexne li nezanîna hin serwer û siyasetmedaran kir û bang li welatiyan kir ku bi serbixwe bifikirin û ramanan bêyî lêkolîn qebûl nekin. Lewma ev yek hişt ku desthilatdar ramanên wî wekî gef li ser xwe û şêwazê desthilatdariya xwe bibînin. Ji ber vê yekê çîna desthilatdar a wê demê, ew tewanbar kirin, sûnc jî ew bû ku mêjiyên ciwanan ji rê dibe û rêzê li xwedayên bajêr nagire. Ew hat girtin, di sala 399'an a B.Z de cezayê darvekirinê lê hat birîn, lê ji ber rêzgirtina wî ji bo zagona welat, qebûl nekir ku ji zindanê bireve, wî jiyana xwe bi vexwarina cehrê bi dawî kir. Lê ew bû sembolek cîhanî ya wêrekiya rewşenbîrî û parastina azadiya ramanan.

**Galîleo ji ber zanistê di bin tecrîda desthilatdariyê de jiyan fena kir**

Galîleo ji 1564'an heya 1642'yan jiyaye ew fîzîknas, astronom û matematîkzan bû û wekî yek ji pêşengên şoreşa zanistî ya nûjen tê naskirin. Wî teleskopek bi kar anî da ku ezmanan bişopîne û rastiyên ku piştgirî didin teoriya ku erd li dora rojê dizivire, teoriyek ku berê ji hêla Nicolaus Copernicus ve hatibû pêşniyarkirin, vedît. Di wê demê de, rayedarên olî ev raman red kirin ji ber ku ew bi ravekirina gerdûnê ya serdest re nakok bû. Galîleo li pêşiya dadweriya desthilatdariyê hate darizandin û ew hate neçarkirin ku bi eşkereyî nerînên xwe yên zanistî vekişîne. Piştre ew di nava mala xwe de bin çavdêriya malê de jiya. Tevî vê yekê paşê zanistê rastbûna vedîtinên wî piştrast kir û ew bû mînakek ji nakokiya di navbera azadiya lêpirsîna zanistî û desthilatdariya dewletê de.

**Imêl Zola ji bo bêedaletiyê hate sergûnkirin**

Imêle Zola di navbera sala 1840 heya 1902'yan de jiyana xwe domandiye, ew yek ji nivîskarên herî navdar ên Fransî û damezrînerê dibistana wêjeyê ya jîwariyê bû. Rola wî ne tenê bi nivîsandina wêjeyî ve sînordar bû, wî destwerdan di mijarên girîng ên siyasî û civakî yên serdema xwe de jî dikir. Ew bi parastina xwe ya efserê Fransî Alfred Dreyfus ku bi derewan bi xiyanetê hatibû tawanbarkirin, navdar bû. Zola nameyeke vekirî bi sernavê "J'Accuse" (Ez Tawanbar Dikim) weşand û tê de rexne li hikumet, dadwerî û artêşê ji ber neheqiya ku li Dreyfus hatiye kirin, kir. Nameyê dengvedaneke mezin çêkir û li Zola cezayê girtîgehê hat birîn, ev yek jî ew neçar kir ku demekê li Brîtanyayê penaber bibe. Helwesta wî bi wî re alîkarî bû da ku doz ji nû ve were vekirin û paşê bêgunehiya Dreyfus were îspatkirin.

**Aleksander Solcenitsyn; Nivîskarê ku bû dengê girtiyên siyasî**

Solcenitsyn ji sala 1918'an heya 2008'an jiyaye ew yek ji nivîskarên herî navdar ên Rûsî yên sedsala 20'an tê hesibandin. Di Şerê Cîhanê yê Duyemîn de wekî efser di Artêşa Sovyetê de xizmet kir, lê ji ber di nameyên taybet de serokê Sovyetê Joseph Stalîn rexne dikir, hate girtin. Ew bi salan li kampên kar ên Sovyetê derbas kir û paşê vê ezmûnê di berhemên xwe yên wêjeyî de, bi taybetî jî Arşîpela Gulagê, belge kir. Nivîsên wî binpêkirinên ku li hemberî girtiyên siyasî dihatin kirin, eşkere kir. Vê yekê hişt rayedarên Sovyetê hêrs bike. Ew di sala 1974'an de hate sergûnkirin, lê wî di sala 1970'an de Xelata Nobelê ya Wêjeyê wergirt û bû yek ji dengên herî girîng ên parastina azadî û mafên mirovan.

**Farec Foda ji ber fikrê azadî û demokrasiyê hat kuştin**

Farec Foda ji sala 1945'an heya 1992'yan jiyaye, ew ramanwer û nivîskarekî Misrî bû, di warê bîrdozî, siyaset û olî de kar û xebat dikir. Wî ji bo welatekî sivîl û ji bo veqetandina desthilata siyasî ji şîroveyên olî yên hişk parêzvanî dikir. Wî gelek gotar û pirtûk nivîsandin, herwiha mijarên demokrasiyê û azadiya derbirînê nîqaş dikirin. Nêrînên wî di civaka Misrê de bûn sedema nîqaşên berfirehû ji ber helwestên xwe yên rewşenbîrî ew bi rexne û gefan re rû bi rû ma. Di sala 1992'an de ew li Qahîreyê ji aliyê hêzên tundrew ve hate kuştin. Îro ew wekî yek ji parêzvanên herî navdar ên azadiya ramanê li cîhana Erebî tê hesibandin û kuştina wî bû mînakek ji kiriyarên xeternak, ev yek jî bû cihê metirsiyê li gel rewşenbîran, metirsiya derbirîna ramanên rewşenbîritiyê.

**Rêber Apo; Fîlozofê nûjen, dîlgirê aştî, maf û azadiyê**

Rêber Abdullah Ocalan di 4'ê Nîsana 1949'an de li gundê Amara yê li herêma Ruhayê ji dayik bû. Dibistana seretayî li gundê Ermenî yê Cebînê yê nêzîkî gundê xwe xwend û xwendina xwe ya navîn li Nîzîpê yê nêzîkî Dîlokê temam kir. Di sala 1968'an de dibistana Pîşeyî ya Anadoluyê ya endezyariya li Enqerê bi dawî kir.

Di sala 1970'î de li Fakulteya Mafnasî ya Zanîngeha Stenbolê dest bi xwendinê kir, lê piştî ku ket bin bandora çepgirên şoreşger ên Tirk ên bi serokatiya Mahir Çayan, di sala 1971'an de veguhezî Fakulteya Zanistên Siyasî ya Zanîngeha Enqerê û bi pileya bilind jê der çû. Di salên zanîngehê de, beşdarî gelek çalakiyên siyasî bû. Yekem beşdariya wî ya siyasî bi çepgirên şoreşger ên Tirk re bû, di derbarê mafê çarenûsa gelê Kurd de helwestek erênî digirt. Piştî ku beşdarî xwepêşandanek protestokirina kuştina Mahir Çayan û neh hevalên wî bû, Rêber Apo di Nîsana 1972'yan de hate girtin. Di Newroza 1973'yan de, wî komeleyeke rewşenbîrî ya ji şeş kesan pêkdihat bi dirûşmeya 'Kurdistan bindest e û azadiyê dixwaze' ava kir. Di 1975'an de, ew bû serokê Komeleya Çand û Perwerdehiya Bilind a Demokratîk li Enqerê.

Di 27'ê Mijdara 1978'an de, Rêber Apo digel bîst û sê hevalên xwe, Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) li gundê Fîse yê Amedê damezrand. Di 2'yê Tîrmeha 1979'an de piştî ku dewleta Tirk li dijî gelê Kurd komkujî pêkanî û endamên PKKê girtin, ew derbasî Kobanê bû. Pêşbîniya Rêber Apo bi darbeyek leşkerî li dijî Tirkiyê kiribû, ev yek çêbû û wî demildest dest bi hewldanên dîplomatîk kir, partî ji bo qonaxa şoreşgerî ya din amade kir.

Wekî gaveke yekem di Komploya Navneteweyî de, ew di 9'ê Cotmeha 1998'an de ji Sûriyê derket. Di 15'ê Sibata 1999'an de ew li Nairobiya Kînyayê hate revandin û radestî dewleta Tirkiyê hate kirin. Di 28'ê Nîsana 1999'an de, li gorî madeya 125'an a Zagona Cezayê ya Tirkiyê, ji aliyê dewleta Tirk ve bi darizandineke sexte hat dadgehkirin. Di 29'ê Hizêrana 1999'an de, bi tohmeta damezrandin û rêvebirina rêxistineke terorîst a çekdar cezayê darvekirinê lê hat birîn, piştre cezayê girtina heta hetayê lê hate birîn. Ji wê demê ve, Rêber Apo li Girava Îmraliyê di bin tecrîdeke giran de ye. Rêber Apo heya niha 5 parêzname, manifestoya Aştî û Civaka Demokratîk nivîsandine, herwiha gelek dahurandinên wî ku weke pirtûk hatine çapkirin. Ew fîlozofê serdema heyî tê hesbandin, fîlozofê aştî, azadî û mafê gelê Kurd û tevahiya gelê bindest e herwiha ramanwerê ku doza pêkanîna sîstema Neteweya Demokratî li seranserî cîhanê dike ye. Ew li dijî hêzên desthilatdar ên ku niha şerê cîhanê yê sêyem didin destpêkirin, e. Di serdema heyî de li dijî planên hêzên hegemon ên ku şerê cîhanê yê sêyem didin meşandin, pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi rê ve dibe, ev pêvajo ne tenê ji bo gelê Kurd li Kurdistan û Tirkiyê ye, lê belê ji bo tevahiya cîhanê kilîta çareseriyê ye. Ji ber ku ev pêvajo bala gelek aliyên cîhanî kişandiye, di heman demê de ji bo ku Rêber Apo bikaribe bi awayekî baş li ser Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk bi rê ve bibe û rewşa tevahiya cîhanê ji nêz ve bişopîne 3 caran xelatgirên Nobelê daxwaza mafê hêviyê ji bo Rêber Apo kirine.



# Şêniyên Qamişlo: Navê Kobanê wê her wekî xwe bimîne

Şêniyên Qamişlo diyar kirin ku Kobanê bi xwîna şehîdan hatiye avdan û naskirin û wiha gotin: "Kobanê wê her tim bi navê Kobanê bimîne, em qebûl nakin ku navê herêmên Kurdî werin guherandin."

Aryen Hesen/Qamişlo

Rêjîma Baas bi çêkirina kembera Erebî re di sala 1962'an de ne tenê armanc dikir ku guhertina demokrafîk li herêmên Kurdî çêbike, lê belê xwast ku hebûna Kurdan ji hole rabike û navên herêmên Kurdî bugherîne, bi her awayî û rêbazî hewil dan ku navê herêmên Kurdî bugherînin û li şûna wan navên erebî lê bikin. Rêjîma Baasê xwest ku navê Kobanê bike Eyn ELereb tevî ku tevahî gelê Kobanê Kurd in. Lê bi wê yekê xwastin ku îrade û nasnameya gelê Kurd li herêmên tune bikin, lê gelê Kurd bi taybet gelê Kobanê bi berxwedanî û sekna xwe ya xort ev zemîn neda wan û her nava Kobanê ya Kurdî weke xwe ma.

Careke din di 2014 û 2015'an de çeteyên DAIŞ'ê bi hemû hêza xwe û bi destekdayî dewleta Tirk êrişî Kobanê kirin û di wê demê de hewaldan ku hebûna gelê Kurd li Kobanê tune bikin û navê wê buhgerînin û bikin Eyn Elislam, lê nikarîbûn. Gelê Kobanê û tevahî gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê ew yek qebûl nekirin, bi têkoşîn û berxwedaniya xwe Kobanê ji DAIŞ'ê rizgar kirin û navê Kobanê li tevahî cîhanê belav kirin.

Niha jî piştî ku gelê Kurd li Kobanê li hember hemû hêzên teror û dagirker sekinîn û li ber xwe dan, di haman demê de Kobanê û axa wê bi xwîna xwe parastin hikumeta demkî a Sûriyê dixwaza cereke din zemîna DAIŞ û rêjîma Baas vegerîne û navê Kobanê bugherîne û bike Eyn Elereb. Tevî ku di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û hikumata demkî a Sûriyê de lihevkirin û peyman hatine îmzekirin ku wê herêm û sûtatoya gelê Kurd li Sûriyê werin parastin jî, lê hikumeta demkî a Sûriyê jî tevî vê yekê bi her awayî dixwaza navê Kobanê ya Kurdî bugherîne û bike navekî Erebî.






Cîhan Gulo



Ayde Mihemed



Kawa Gulo

Her kes Kobanê nasdike, Kobanê Kelaha berxwedanê ye ku bi xwîna şervan û gelê Kobanê hatiye avdan. Navê Kobanê li cîhanê bi berxwedanî û têkoşînê tê naskirin. Gelê Kurd li Rojavayê Kurdistaanê guhertina navên herêmên Kurdî ji aliyê hikumete demkî a Sûriyê ve şermezar dikin û tu carî qebûl nakin ku nasnameya Kurdî were tunekirin.

Di vê çarçoveyê de şêniyên Qamişlo ji Rojnameya me re axivîn.

**'Navê bajarê Kobanê wê her weke xwe bimîne'**

Jina bi navê Cîhan Gulo destnîşan kir ku ew qebûl nakin navê Kobanê were guhertin û wiha got: "Hikumeta Sûriyê a nû dixwaza navê herêmên Kurdî bugherînin, em tu carî vê yekê qebûlnakin. Navê bajarê Kobanê wê her weke xwe bimîne, em wê yekê şermezar dikin Kobanê keleha berxwedanê ye, me bi hezar Şehîd li Kobanê danîn da ku em Kobanê rizgar bikin. Keç û xortên Kurd li Rojavayê Kurdistanê li ser axa Kobanê gihaştin asta şihadetê û bi xwîna xwe Kobanê bi serxistin. Tevahî gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê li pişta Kobanê ye, em nahêlin ku navê Kobanê bibe EYN EL EREB. Bajarê Kobanê hertim ya Kurda bû wê hertin bimîne ji Kurdan re."

**'Xweşikbûna Kobanê bi navê wê ya Kurdî ye'**

Jina bi navê Ayde Mihemed jî da xuyakirin ku ewê bi tekoşîn û israra xwe planên li ser herêmên Kurdî têkbibin û wiha pê de çû: "Berî niha jî gelek hêzan bi planekî mezin xwestin ku navê Kobanê bugherînin û îradeya gelê Kurd li Kobanê bişkînin, lê nikarîn. Em dengê xwe bi dengê gelê Kobanê re bilind dikin û em piştgiriya wan dikin, em tu carî qebûlnakin ku navê Kobanê were guhertin. Xwaşikbûna Kobanê bi navê wê ya Kurdî ye, em ê berxwedanî û israra xwe berdewam bikin û em nahêlin ku navên herêmên Kurdî werin guhertin û li şûna wê navê Erebî lê were kirin. Çiqas hewalbidin planan li ser gelê Kurd bimeşînin û hebûna wan tune bikin, emê bi tekoşîn û israra xwe ya ji bo misogerkirina hebûna gelê Kurd di Sûriyê de van planan têk bibin."

**'Hikumeta demkî a Sûriyê lihevkirinê binpê dike'**

Welatiyê bi navê Kawa Gulo da zanîn ku bi guhertina navên herêmên Kurdî re dixwazain dîroka gelê Kurd li Sûriyê winda bikin û wiha anî ziman: "Gelê Kurd li Sûriyê xwedî herêm û zimane, bi salane ji bo misogerkirin û parastina vê yekê têkoşîneke mezin didin meşandin. Guhertina navê Kobanê bamafiyeke mezine li bermaberî gelê Kurd, em jî vê yekê qet qebûlnakin. Ev guhertin binpêkirin û êriş li ser doza gelê Kurd e. Di 29'ê Çileyê de navbara Hêzên Sûriya demokratîk û hikumerya demkî a Sûriyê de lihevkirinek hate çêkirin ku wê xwasertiya herêmên Kurdî werin parastin, lê ev yek li ser erdê nehat pêkanîn, hikumeta demkî a Sûriyê berovajî vê lihevkiirnê tevdigere û wê binpê dike."

# Firoşgeha Gula Qamişlo; li kêleka besteniyê tabloyeke hunerî ya estetîk

Solîn Mihemed/ Qamişlo

**Firoşgeha besteniyê ya bi navê Gula Qamişlo ku bi şêwazekî cuda hatiye vekirin bala welatiyan dikşîne. Xwedî û firoşkara firoşgehê diyar kirin ku armanca wan ji vekirina firoşgehê kêfxweşiya jin û zarokan e.**

Li dilê bajarê Qamişlo, projeyeke nû deriyên xwe li pêşberî welatiyan, bi taybet jin û zarokan vekir. Firoştgeha besteniyê ya bi navê "Gula Qamişlo" bi teşeya xwe ya taybet ku bi gulên reng pembe hatiye xemilandin, di demeke kurt de bala her kesî kişand. Ev der wekî yekemîn firoştgeha besteniyê ya bi vî şêwazî li bajêr tê naskirin, ku hunera xwarinê û bedewiya xwezayê û rengan tîne cem hev.



Ayaz Esad




Esma Salih

Firotgeha "Gula Qamişlo" ne tenê ji bo xwarina besteniyê ye, lê bûye wekî tabloyekî hunerî li kolanên bajêr. Sêwirana firotgehangê bi gulan hatiye hûnandin, ku ev yek dîtbareke bêhempa dide mêvanan. Ev proje nîşan dide ku rûyê geş û nûjen ê Qamişlo her tim ber bi pêşveçûnê ve diçe.

Di derbarê mijarê de xwedî û firoşkera firoşgeha besteniyê Ayaz Esad û Esma Salih ji Rojnameya me re axivîn.

Ayaz Esad diyar kir ku wî di meha 6'an de firoşgeha bestenî li bajarê Qamişlo da vekirin û wiha got: "Me beriya mehekê ev firoşgeha besteniyê vekir û nave Gula Qamişlo lê kir. Armanca min ji vekirina firoşgehê ew e ku ez kêfa jin û zarokan bînim, armanca min ne qezenckirina pereyan bû. Ev firoşgeh jî bi tayîbet ji bo jin û zarokan e, ji ber me hemû firoşgeh bi gulên pembe xemilandiye. Ji ber ku ya jinan e min du jin di firoşgehê de danîn da ku pêşwaziya xelkê bikin. Firoşgeh jî bi strana gulê herem pêşwaziya mêvanan dike. Firoşgeh ji seat 10 ê sibehê tê vekirin û heya seat 12 êvarî dimîne. Ji dema ku me firoşgeh daye vekirin, çûn û hatina xelkê jê re zêde ye ji ber ku pir kêfa wan jê re hatiye. Di destpêka ku me firoşgeh vekir me pir zehmetî tê de kişandin, herî zêde ji aliyê elektirîkê ve. Weke ku tê zanîn di firoşgehê de bestenî, cûreyên avên fêkiyan û silaş heye, buhayên wan jî ji 10 hezarî heya 35 hezarî tê firotin. Lê em niha tiştin din hazir dikin ji bo dema pêş em dabixin ew jî mîna koktêlên fêkî û hwd."

**'Ez bi karê xwe pir kêfxweş im'**

Esma Salih da xuyakirin ku ew pir kêfxweş e ku di firoşgehê de kar dike û wiha anî ziman: "Ez pir kêfxweş im di vê firoşgehê de da ku ez kêfa zarokan bîn im. Ji ber dema zarok tên em stirana gulê û her wiha bi reşandina gulan li ser wan û dayîna taca gulan li ser serê wan, ji bo me û wan kêfxweşiyek e. Îro kêfxweşiya zarokan ji bo me pir girînge da ku em bi riya firoşgehê kêfa wan bînin. Em bi hêvî ne ku em hîna pêşveçûnê di firoşgehê de çêbikin da ku her kes serdana me bike. Ji dema ku firoşgeh hatiye vekirin û heya niha bûye wek tirênd ku li her derî hatiye belavkirin, ev jî ji bo me kêfxweşiyeke ji firoşgehê re."